




Barîyê Bala


DAYÎK

Barîyê Bala

DAYÎK

Bîşkêk – 2009

Weşanên Zengezûr



Delalê min, dinya ma,
Hatî tev çûn, dinya ma.
Bextewarê ew kesa,
Dû wî navekî qenc ma.

Tew xelatê ji bîr herîn,
Ev xelata mînê bijî.
Tew hatîyê yek yek herin,
Nav wana da ez û hûn jî.

Barîyê Bala

DAYÎK

Resûlê xwedê qîmetekî
Gelek bilind te ra daye.
Timê gotiye, cineta heq
Binê piyê dayikadaye.

Барийе Бала

МАТЬ

Бишкек – 2009

Издательство Зангезур

DAYİK

*Rewayî malxuya mala Şirinê Eliyê Hesîkê Fatma xanima
rehmetî dikim.*

Wekî kes min ricim neke,
Nelomîne, ji min pirske.
Ezê bejîm, rûyê erdê,
Xwedê pêştir, xwedê dayîke.

Ji we mestir kesek tune,
Wek we şîrîn, tem qet tune.
Hemêza we heq cinete,
Wê evzeltir, cinet tune.
Tu welatî, welat tuyî,
Tu ronaya herdu çavayî.
Nûr-nedarî, him jî jîne,
Ji we kûrtir, tu ber tune.
Çiya pêş we tim xar dibin,
Tu tunebî, bînber nabin.
Erşê-ezmîn safîtirî,



Ava zamzem zelaltirî.
Didî lawa, zar û ziman,
Tu wan dikî şêr, pelewana.
Cewahirî, lel û durî,
Namûs, xîret, tacê zêrî.
Ewledê baş rewşa te ne,
Merîfeta şîrê te ne.
Sucde dike alem pêş te,
Nayê bîrkin qet kedê te.

Şerê cihanê duda re-reç hîştibû,
Dinya ronik têr nefesek hilneda bû.
Tevgelên şêr gelek paşda ne hatibûn,
Boy azaya welatê xwe şehid bibûn.
Feqiriyê hukum dikir hemû ciya,
Dayik û xwîşk bûbûn pepûk serê riya.
Neketibû tu qaydeyê rizma dinê,
Dinya kiribû bin hukmê xwe birçibûnê.
Meydana şêr vegeryabû genc Mehmûde,
Wî dîtibûn qewmandinên zehf bêhûde.
Pêşîra wî dixemiland pir mêdala,
Melhem dida ser birînên herdû mila.
Boy şehîda dikewgirî, dinaliya,
Nolî mûmê dişewitî, diheliya.
Dikir qise, hovîtiya faşîstên har,
Gund-bajarên dişewitîn, dibûn tar-mar.

Zêre-zêra sexîr, sêwiyên ber dîwara,
Kal û pîrên bêkes mabûn li şûn wara.
Şev û roja digot, digot, diqilqilî,
Behra fikra dernediket qet tu alî.
Emir giliyê xwe dibêje rengbirenge,
Şuxlê îro bikî sibê, pir derenge!
Tev hevala xwe ra çêkir xanîkî çûk,
Bac xatûna esilzade anî wir bûk.
Her kedheza pişt kutane pişda heve,
Rojên germ, sar rêdikirin cîkî, teve.
Şîrşihetî du ewladê wan hevdu dî,
Ewîl Memê, yê din Elixanê cindî.
Şabûn, qotin, bextewarî em vê dinê,
Şabûna wan nedihate pîvandî.
Wî heyamê zorî, zexmî, pir giran da,
Rebbê jorîn doteke rewş par da wan da.
Dost û pismam hemû hatin wê fikrêye,
Wêra danîn navê hezret Fatimêye.
Gotin, bila tengî-telya timê dûr be,
Boy xatirê evî navî bextewar be.
Wê rojê da Mala Mehmud bû têr-tîjî,
Xêr û xezne barî ser pismamên wî jî.
Fatma dibû kulilkeke teze-tere,
Dem-sifetê wê dibarî misk, enpere.
Reş kezyên wê berjêr dibûn ser neniya,
Geleka ew nîşan dida bi tiliya.

Çû dibistan, hemû dera wê stend pênce,
Navê wê ket nava xwendevanê qence.
Xwendina navîn xilazkir serfînyazî,
Bav, bira, dê, xwişk, hemû jê bûne razî.
Dû xwendina bilind, veqetîya male,
Hogirên wê hemû civyan, hatin bale.
Wêra xwestin emrê dirêj, bextewarî,
Gotin: bibî, tu qismetê comerd mêrî.
Geleka xast, lê kek Mehmûd ne got erê,
Îdî kesî culet nekir pêşda werê.
Dibuhurîn roj, meh, salên giran, sivik,
Fatma dibû, bedeweke cindî, nazik.
Rebbê jorîn aqil, kemal, bext da wêye,
Kir malxuna Şîrînê kurmamî wêye.
Hatin dinê du ewladê wane delal,
Ruslan, Eli, nişa xase paqîş, zelal.
Emir boy wê dibû şîrîn, him jî şerbet,
Bûna lawa dida wêda sebir, tawet.
Fatma hê derketibû bilind ciye,
Ezraîl bû mêvanê nevsî wêye.
Nehîşt bike, ew emrekî dirêj, tere,
Gotê bese, wedê teye, îdî here.
Mecal nede, Şîrîn bike yek weysête,
Bêje kurmam, îdî diçim, de xatrê te.

Fatma xanim!

Xwişka delal, me neqete, qelek zûye,
Lez nakeve, boy jîna te wede heye.

Bahar hatiye, ne dernege,
Tev xwe aniye, hezar renga.
Kew çêdikin germ hêlîna,
Bilbil tînin nû mizgîna.

Bahar hatiye, berf heliyaye,
Xuşe-xuşa çem kaniyaye.
Dixemilîn deşt, beyare,
Zûye, neke, kar û bare.

Bahar hatiye, bînber şane,
Esman nagre, mij-dûmane.
Her law dîkin zare-zare,
Şîrîn îdî extiyare.

Were em herne Kurdistanê,
Bixwîn ava kaniyên Wanê.
Mêze bikin sîngê çiya,
Daristana, şaxên geliya.
Dîsa herin nav hevala,
Mala Şîrîn nehêl vala.

Gulê welêt biçîrpînin,
Ser gêrîla cot-cot daynin.
Tewaf bikin merzelên wan,
Bitewînin serê xwe pêş wan.
Sihkin tema doza, qala,
Şîrîn nehêle ji hevala.

Xwişk, biratî pir şîrîne,
Tem û lemê ser zimîne.
Kes nikare wê înkarkê,
Nê kêmbike, ne zêdeke.
Ro tu nebe, hîvê nebe,
Hîv tûnebe, royê nebe.

Ev ecêva kê dîtiye,
Bira here dinya heqe.
Xwişk tafilkê bide duye
Bê wî neji qet daneke.
Her tiştekî heye hedde,
Şîrîn teng tê dinya bê te.

Ezraîl ra neyê rayê,
Însan carnê wê dinyayê.
Gelek roje bê faydene,
Dawiyê ça be, kes nizane.
Bûyî destan boy hemûya.

Çiqas hebe, eva dinya.

Şev û roja te tim ked kir,
Şîrîn ra bûyî heval, hogir.
Rojên sar, germ, we pêkirin,
Boy lawên xwe mal çêkirin.
Ber lawên xwe şa ne bûyî,
Wede zûtir çima çûyî?

**

Nolî gula hê vedibû, ter bengizê te,
Payîz zû hat, bê wede bû mêvana te.
Tew belgên te çilmisandin, zer kir wek zêr,
Bê kirina te, bilind kirî gelek ji zêr.
Rûslan, Elî, te zû hîştin tim bê dayik,
Nûrê, Şîrîn te kêr dîtin, man bê pîrik.
Ecel nehişt, def-deweta wan bibînî,
Cî-nivînê ber perda wan, tu xwe daynî.
Bûk Cemîle qet têr nebû, dîndara te,
Xwişk û bira bûna rijî, qewal boy te.
Pîre dayka hêsiyê rêtin, kirin lûvîn,
Nalîn, zêwîn, gihîşt qatê erşê-ezmîn.
Tebîet şaş ma, ricifî, hejiya, rabû,
Nav xema da keser kişand, leqya, ba bû.
Ber keliyan, lepa dû hev kendal kuta,
Cema gotin, çi qeziyaye, ev çi xeta.

Ewra deng dan, ba-baranê kire lîlîn,
 Gul, kulîlka îmdad xastin, rebbê jorîn.
 Fêkî, reza, xwe xar kirin, girtin matem,
 Xezal meşyan, peşmûr-peşmûr kirin sîtem.
 Cî tevizîn, teyr, çivîkên ser hêlîna,
 Tu terewil derneketin ji nav lana.
 Mitheyr-mitheyr hevra şandin caw, bersive,
 Gotin, me qet nedîtiye ev ecêve.
 Dewir-zeman tîn û diçin, nav dimîne,
 Her kirinek dîrokeke tel zemîne.
 Boy qurna me bûn dîrokek, xêlif tune,
 Navê teyê tim bimîne, gilî tune.
 Cesedê te emê bibin Kurdistanê,
 Defîn bikin, cem ziyaretê Mem û Zînê.
 Hemû gelê biewirin merzelê te,
 Gulê welêt baq-baq daynin ser tirba te.
 Xec bê Siyabend, dinya ronik nexast bijî,
 Zîn boy Memê xwe heliya, xwe kir rijî.
 Tu jî bûyî xwişka wana, sert meşyayî,
 Bê Elîxan¹ dinya meda tu nemayî.
 Sê stêrk hene asîmanê Kurdistanê,
 Şeveq didin, dixemlînin tew cihanê.
 Yek Xecêye, yek Zînêye, yek jî tuyî,
 Xwişka delal, bilindaya serê meyî.
 Emê pêş te tim bitewin, temennebin,

¹ Elîxanê Mehmûd, birayê Fatma xanime. Wedê cawa mirina Elixîn ku didine Fama xanimê, çend saeta şûnva ew jî dinya xwe diguheze.

Tu car, tu dem, te bîr nakin, heta hebin.
Emir da jî pêş tu kesî ne tewyayî,
Xanim, xatûn, ser bilinde, mêranî bûyî.
Çanda gelê xwe, destê xwe te xemiland,
Hebûna xwe hemû danî, nehêvişand.
Digot, welat, ji ruhê min şirîntire,
Her gerîlla ji me gişka bilîndtîre.
Huba welêt dilê te da çû axa sar,
Dinya hevket, boy te reş hat, îcar bahar.
Welatheziya te bîr nakin, tu car, tu dem,
Çûyî, me ra, bê hed hîştin, me keder-xem.
Culetê te, ecêbmayî mane gelek,
Tu jî jiyî, tel û şîrîn tenê emrek.
Her saleke te bû yek sal, ket dîrokê,
Bûn dastan, dernekevî ji naverokê.
Nislê nûhê timê bêne ziyareta te,
Wê hevdura qise bikin vê kirina te.
Tewê pêşe te temennebin dubar, dubar,
Hinekê jî hêsrên şewat bînine xar.
Fatma xanim, nesîbê te bû cinnete,
Ruhê te, tim dimeşe me ra cote.

Fatme bîhîst, eva cawa nevxêryêye,
Kaliya, naliya, boy ronaya çavê xweye.
Got: ya rebbêm, ev çi zulm bû te da me da,
Şêra mêra, wede zûtir nav me hilda.

Dergê rehmê te vekira hevek pêş me,
Bê baharê şîn nekira malbeta me.
Got û biland, hêşir rêtin gerand giriya,
Xwe gîhande cîkî xewle, dûrî meriya.
Lavî kir, bangorî bû rebbê jore,
Got: Ya rebbêm, îdî bide min jî gore.
Bê Elîxan tu car najîm ez vê dinê,
Ez dixazim, tenê ji te yek mirinê.
Xwedê qebûl kir lava wê xatûnê,
Wede zûtir, ew jî bêçilk bir ji dinê.

Vê biraheziya Fatma xanimêye bê hed, ser dilê min rêçeke
gelekî kûre, giran hîşt.

Loma jî, min ev qewimandîna pîr mezin hilda qelema xwe.
Xast bi culqetekî mêranîva bêjim: Fatma xanim, xwişka delal,
ez pêş rûhê we sucde dikim, bejna xwe ditewînim. Dibêjim:
Egîta birahez, hezar-hezar cara rehma xwedê li we be. We bi
vê kirîna xweva, gelek-gelek ecêbmayî hîştin. Mala heq da
rihet razê.

MEVLUD

Çawa bû, wekî min ev nivîsara xweye bi
curê motîva poêziyayê olî rewayî
rojbûna pêxemberê axir-zeman, Mehemed
elêyselam kir.

Carekê, meclîseke pir giran da nav êlê
da nav û dengî, pîrgedir Ezîzê Ziyoyê
Bedirxan ji min pîrsî: Xalê Barî, tuyê
bikarîbî derheqa rojbûna Mehemed
elyselam da mewlûdeke piçûk binivîsî?
Min gilî dayêda, wekî ezê vê xasteka
wî biqedînim.

Loma jî min boynet qedir û hurmeta wî
mirovê comerd û welathez, ev zehmeta
kişand.

Ji dayikbûna Mehemed eleyselam girtî,
hetanî dinya xwe guhastina wî ev
mewluda hinekî dîrokiye piçûk nivîsî.
Rewayî rojbûna Resûlê xwedê pêyxemberê
acir-zeman kir.

Giliyê dawiyê dispêrme xwendevanên
xwe.

MEVLUD

BEŞA YEKÊ

*Xwedê pêştir xwedê tune. Mehemmed Eleyselam
pêştir Resûlê xwedê tune.*

**Eşhedu enne la ilahe îllellah, we eşhedu enne
Mehemmedun Resulullah.**

Rebbê Jorî!

Bê şîrîkî, bê hevalî, tek tenêye,

Xuliqandiye erş û kursî tew heyêye.

Boynet benda bîne riya ew heqyêye,

Resûlekî delal xwe ra bijartiye.

Mehemmede, ji qebîla Qurêşanêye.

**

Navê xwedê dikişînim, ez ewliya,

Beyan dikim, ewî boynet me hemûya.

Kesê ewil navê wiya bîne zare.

Ji qudreta wî namîne ew bê pare.

Ew Kerime, ew Rehîme, ew Rehmane,

Ew Ehede, ew Wehede, him Loxmane.

Ew Qadire, ew Nadire, hewardare,

Ew Hebîbe, ew tebîbe, him ruhdare.

Kî pêş wiya serê xwe tim bike xare,

Ewê bibe têr mal-ewled, bexteware.
 Rêşûlê Ekrem kî bîr bîne, hergav, her dem,
 Nesîbê wî tu car nabe keder û xem.
 Kî sidqê sax bêje Xwedê, bibe Îslam,
 Hemû guna efû dibe, ew veselam.
 Dilê kê da hebe zikir, merhemetî,
 Digihîje her mûradî, xwedê gotî.
 Werin em tev bikişînin navê Xweda,
 Riya wî da bibin finê, bibin feda.
 Ewa kesê bawer neke rebbê jore,
 Jan û êşa, xem-kedera nabe dûre.
 Ew bendeyê bîyet bike, wî nadşahî,
 Ewê bibe pak û paqîş, him îlahî.
 Cumle alem qet tune bû, ewa hebû,
 Boy kirinên xwe serfînyazî, eşq û şa bû.
 Ew ku hebû, qet tune bûn horî, melek,
 Ne erş-kursî, ne roj û hîv, ne tu kesek.
 Ruhber, bê ruh, hemû ewî xuliqandin,
 Çar kitêbên nûh esmanî ewî şandin.
 Wî rehma xwe parevekir ser hemûya,
 Ewe xweyê erş û kursî, ter û ziya.
 Ew nebûya, wê nêbûya eva cihan,
 Ne dixuliqîn cinnet, cehnem, heşîr mîzan.
 Wî ax-avê, ba û agir çekir Adem,
 Dayka Hewa wîra anî dost û hemdem.
 Adem dijiya cinnetê da şa, bextewar,

Nizanibû çine neqenc, ne jî xirav.
 Ro, şevêkê genimekî têrê dîkir,
 Ewa dixwar, xwedê xwe ra şîkir dîkir.
 Felqê genimê şeytan anî Adem bû jehr,
 Xwedê Adem ji cinnetê avîte der.
 Tek û tenê, çol-çolistan ew geriya,
 Sitar nedît, şev û roja tim giriya.
 Wedê ku dît li esmanê çikî-sayî,
 Nivîsare navê Mehemmed Resûlê wî.
 “La îlahe îllelah, Mehemmedun Resulullah”.
 Zaravekî pir-paqîşî, ferih zelal,
 Wî bilind xwend, ew ayeta rebbê delal.
 Zû çok veda, kir iltîmas, lavayiye,
 Got: Ya Rebb, min bide xatrê wî naviye.
 Xwedê li wî hate rehmê, ew efû kir,
 Girê Eref dayka Hewa cem peyakir.
 Adem, Hewê sed çil çar ewlad hatin dinê,
 Dawiyê de hevtê du gel ketin holê.
 Jîn dest nebû, hindika kirin dilik,
 Minafiqiyê qepeçe kir, her qulç, qunçik.
 Bende ketin riya xirab, bûn beyanî,
 Bira îtbar li birayê xwe qet neanî.
 Kê çi dixast, ew jî dîkir, bê şerm, şike,
 Boy wan dê-xwîşk, îdî hemû bibûn yeke.
 Tew bûn melqûm, reh da xwedê ne nasiyê,
 Qenc bûn unda, dil tîjî kir fesadiyê.

Xwedê hers bû, dema ku dît eva hala,
Boy tew benda wî nazil kir jan, êş, bela.
Rûyê erdê avê hilda, nema kesek,
Hûh kir keştiyê, her bînberî tenê cotek.
Pir geriya, tu cî nedît, sî-siterek,
Ser Cudiyê ji xwedê xwest wî îmdadek.
Av vekîşiya, erd ziwa bû dîsa girt rewş,
Hatin xanê pîr mirovên zer, sipî, reş.
Merivayî da sekinî, jiyan kelya,
Dinya ronik geh xemilî, geh jî girya.
Paşê hatin sed bîst çar hezar pêxembere,
Hinek mane bê pêz, hinek bûn xwedî sere.
Îsa, Mûsa, him jî Dawûd hatin û çûn,
Dewrana xwe derbaz kirin, kêman armanc bûn.
Sultan Selêman pûta teyra çêkir xanî,
Îbrahîm jî qira pûta destê xwe anî.
Rêbbê jorîn boynet hilde kêmasiya,
Rêsulê xwe, îdî şande nav meriya.

BEŞA DUDA

Rebbê jorîn xeleq hevdu hilkişandin,
Du kulîlkên bîne, cindî xuliqandin.
Yek Evdilê bejin-balî, rindî, nazik,
Lawê Evdilmutelibê nerm, perik.

Ya din Amne, horya bê çilk, zerya delal,
 Dota Evdilmenafê heqî helal.
 Herdu piçûk mezin dibûn bê kêr, me'nî,
 Hevdu nedît bûn wana tu mikanî.
 Wedê gihîşt hinek îdî dema wana,
 Pir gelek hewal dida derheq wana.
 Herdu bava, bê wan herdu dane heve,
 Rojên tel-şa rê dikirin wana teve.
 Emrê xwedê xatûn Amne bû duhale,
 Hemla xwe da wê digerland nûr-cemale.
 Wedê Amne a hemle bû vê zarêye,
 Şeş meha da dengê hate guhê wêye.
 Got: Ya Amne, zanî hemla te da kiye?
 Pêxembere, ew resûlê rebbê teyê!
 Hindik ma bû Amne dayne hemla xweye,
 Ewa denga dîsa hate guhê wêye.
 Derheq denga qise dikir hogirê xwe ra,
 Pir nerihet dibû, ew vê zara xwe ra.
 Roj dibûn meh, meh qut dibûn wedê xwe da,
 Qedrê Amne bilind dibû nav êlê da.
 Gişka ji wê pir hez dikir, dihebandin,
 Hineka ji pêş wê bejn ditewandin.
 Amne îdî ser xwe ketibû nav şikêye,
 Nizanibû, ev hurmeta seva kêye?
 Wedê Amne wê daniya hemla xune,
 Cem wê hebûn gelek horyê dinya dine.

Nav wan da bûn du xanimên şaşê-pere,
 Nedihiştin Amne ji wan qet dûr here.
 Yek Asya bû, horiya delal, sitya Fîrquîn,
 Ya din Meryem, dayka Îsa, dota Umrûn.
 Diqedandin wan fermana rebbê jore,
 Ji şabûna nedidan hev mecal, dore.
 Wan tiştêkî çîl-sipiyî nolî avê,
 Kuzikekî vala kirin, dane Amnê.
 Ew şerbet bû, xwedê şandbû boy Amnêye,
 Amne vexe, hêsa dayne hemla xweye.
 Ew şerbeta Amnê vexwar, pir hêsa bû,
 Pişt perdê da hemla xwe danî, gelek şa bû.
 Bav Evdile, dayik Amne, horya delal,
 Neh meh şûnda hate dinê sahîb kemal.
 Horiya sinia pîrûzêda av wî kirin,
 Enper lêdan, herdu çavên wî kil kirin.
 Perda sipî jor berjêr bû heta erdê,
 Ewir Mehemmed li wê pêça hilda hewê.
 Dengêkî got: Başûr, Bakûr, pê bike nas,
 Bêje, qasidê rebbê weye, pê bibin nas.
 Teyrê sipî nikul lêlî, bask cewahir,
 Dûr firî hat, ewê demê sekinî wir.
 Pê baskên xwe, ser Mehemmed kire siye,
 Yalê xwe da wî nîşan da ev qenciye.
 571-ê mîladê, danzdê nîsana pir delale,
 Stêrkek derket asîmanê Şerqa kale.

Ronahî da, Başûr, Bakûr, tew Rojhilat,
 Boy tew benda ew bû rênîş, him da îmdad.
 Ewê şevê ro kenîya, stêrk, hîv şa bûn,
 Behra lêp dan, hemû bînber jî xew rabûn.
 Erd xemilî, ewra hevra kirin gazî,
 Berf heliya, kulîlk vedan darên tezî.
 Bê ne lîland, baran nehat, zer hejiyan,
 Teyrik-tûya bask vekirin, bilind firîyan.
 Tav reqîsî, zû-zû maç kir banî, berek,
 Tew terewil, civiyan cîkî, kirin henek.
 Şa bûn, mizgîn ser mizgîna dane heve,
 Gotin: Qasidê xwedê dêda bû îşeve.
 Şeva firq bû, ew bedena dayka xune,
 Amnê zû da unda kiribû malxuyê xune.
 Genc Evdile defîn kirin li Medînê,
 Çavên Amne xalî nedbû hersên xwînê.
 Ewê şevê pir qewmandin çêbûn dinê,
 Sûynê koşka Kîsrar ketin li Îranê.
 Gola Sava çû bin erdê, nehat xanê,
 Kes raneza, ne li Mekê, ne Medînê.
 Pût hevîntî hat hildanê ruyê dinê,
 Alem bû nû, rozgar hate guhastinê.
 Agrê mecûsiya îdî tew temirî,
 Bizans yekcar kete nava şîn û girî.
 Amnê tîfal hindik mêjand, çend mehane,
 Zûtirekê lawê xwe da yeke dine.

Mekke germ bû, bahar, payîz, him havînê,
 Zarên şîrmij, pir nedijîyan nav vê germê.
 Malbeta zarên xwe didan daykên çiya,
 Wana ew zar dimêjandin mîna diya.
 Amnê Mehemed da Helîma gelek rehme,
 Wekî tîfal zîqa neke hewa germe.
 Helîme bû dayika wiye şîrê sipî,
 Wê hemêza xweda wîra çêkir şûn-cî.
 Dilekî şa, Mehemed bir wê cem xune,
 Wê ew heband nolî zara zikê xune.
 Helîmeye koçervan bû dijiya çiya,
 Mehemed dihat hewa paqîş, ava kaniya.
 Şeş mehê da rûyê wêya ew keniya,
 Hewzanibû dane wêda, temem dinya.
 Neh mehê da ew piya çû, nolî merda,
 Yek saliyê da firih, paqîş, wî xeberda.
 Helîme mitheyr mabû ser vê zarê,
 Emrê xwe da zar ne dîtibûn wek vê zarê.
 Şevêkê da mezin dibû wek çend şevane,
 Wî hezdikir, weke nûra herdu çavane.
 Evdile ra diçû çema, belekiya,
 Car-carana hildikişya sîngê çiya.
 Kengê ewî pî avîte sala çara,
 Tev birê şîr, diçûne ber berxa, kara.
 Helîme ew ber çavên xwe nedikir dere,
 Boy wî diket nav milalên gelek kûre.

Digot: “Emanet, qiyamete” gotiye beriya,
Zûtireke min ev zara bida xweya.
Rojek, roja bedewe sayî, cîkî fire,
Baran vebû, ewra nekir gure, gure.
Tav zeriqî, keskesorê da bereka,
Xuşîn kete cem û kaniyên dor kêleka.
Gul-sosina gerdena xwe quloz kirin,
Hemû maka hûrkên xwe ra risq dibirin.
Mehemmed palê xwe kuta bû kevreke çûk,
Her çar hêla mêze fikir kurkê piçûk.
Hatin xanê du zilamê çile sipî,
Bejn-balê da kes tune bû wek wan cindî.
Wan Mehmedmed pir nihêrîn, gotin eve,
Nerm nêzik bûn, wekî ji wan ew nereve.
Wan ew hilda bilind kirin serê çiyêye,
Hêdî danîn, kes nabîne wê kîrnêye.
Hev xuldirîn, ewa nevsên xeybê hatî,
Şîr birê wî, ev ecêba çavê xwe dî.

Sîngê wiya tew vekirin pir tişt danîn,
Nav dêlê wî niqitkeke reş hilanîn.
Wî deng nekir, ne kir qîrîn, ne jî qûjîn,
Ji xew rabû, nekir afîn, ne jî îskîn.
Ew wê demê bû nevseke paqîşe, nû,
Hemû tişt jî hevdu bijart, hatanî mû.
Çar salên wî ku bûn temam cem Helîmê,

Ça barekî giran hildin îdî ser wê.
Got: - Amine, kurêx hilde tu cem xune,
Rica dikim, tu qet heqî nede mine.
Amne şa bû Mehemed bir, wê cem xune,
Şev û roja ew kir nava dilê xune.
Hindik mabû, Mehemed qutke sala şeşa,
Amne xanim çû mala heq, ew nebû şa.
Bapîrên wî, Ebdulmutterlib ew bir cem xune,
Ji wî hezkir, wek ronaya herdu çavê xune.
Heyşt salê da wî unda kir kalkê delal,
Ma bê sitar, ma bê tutar, him jî bêmal.
Bu sêwîkî bê dê, bê bav, him bê dewlet,
Kîşand ezab, kîşand cefa, him pir zehmet.
Ser ruhê wî rêç dihiştin salên giran,
Mamê wî Ebû Talib xwe kir heyran.
Deh duda da mamê wî ew bire Şamê,
Cara ewil be çavên xwe wî dît dinê.
Deh şeşa da tev tucara çû Suryayê,
Li wir wî dî rarozgara mirovên dinyayê.

Wedê Mehemed pî dadanî axa şewat,
Bin piyên wî dibûn hênîk, diçû rihet.
Ser serê wî timê hebû ewrekî reş,
Sîke hênîk dida ser wî lê dibû rewş.
Zanê Cihû ketibûne rêça wiye,
Pir dixastin zû nas bikin nevsî wiye.

Ji Tewratê, wan zanibû kiye Mehemed,
 Ne nasya wî, wan tewara dida pir kufaret.
 Rebbê jorîn siya xwe ser wî hilnedida,
 Remildarê Cihû boy wî dibûn feda.
 Zehmetê wan nedgihîşte, qet tu ciya,
 Mehemed rihet, welat-welat digeriya.
 Bu xortekî pir bedewî, him zerpedest,
 Ew kavranê bêra diçû, lê nedibû qest.
 Bazirgana boy wî hevra fikir şere,
 Her yekî dixast Mehemed tevî wî here.
 Xedîcê bihîst ev seda guhê xune,
 Keç xatûnê tafilkê bir ew cem xune.
 Ewîl kire kavranvanê kavranê xwe,
 Paşê da wî, tew rusqeta dewleta xwe.
 Roj dibûn meh, meh jî salên tele-şîrîn,
 Geh baş dibûn, geh jî dibûn jan, êş, birîn.
 Xedîceye zef zanaye, pir maqûl bû,
 Nav êlê da xanimeke nav û deng bû.
 Destvekirî, bi merîfet, merivhez bû,
 Emrê xwe da çil saliye navser bû.
 Genc Mehemed helaliyê pir hez dikir,
 Boy eslê xwe Xedîcê ra xizmet dikir.
 Wî şerm dikir, jî Xedîcê tişt ne dipirsî,
 Xedîce wî bibû bengî, nedigot kesî.
 Keç-xatûnê fersenda xwe neda bade,
 Nefîsêra dilê xwe vekir, emrê xwe da.

Mehemmed bihîst ev mizgîn ji Nefîsêye,
 Nizanibû xastina xwe bêje kêye.
 Nav mitalên gelek kûr da dixuldirî,
 Mitheyr mabû, ew here ber kijan derî.
 Geh şerm dikir, geh şa dibû, geh jî pejmûr,
 Sêwîtiyê wî kar dikir, jê nedibû dûr.
 Dil-dînê xwe wî tev anîn, merd-merdane,
 Got: Xêncî mamê xwe, ez nabêjim tu kesane.
 Bist pênc salên wî kengê bûne qute,
 Ji mamê xwe rica kir wî bike cote.
 Vê xastekê Ebû Talib kir hişmetkar,
 Kûr fikirî, dûr fikirî, kire qîrar.
 Got: Lawê min, wede hatiye, nebe pejmûr,
 Ev xasteka teye kiye, jê nebe dûr.
 Min ra bêje, kê dixazî, keça kêye,
 Ew anegorî qebîla me, nevs a teye?
 Nav şermê da wî Xedîce kire beyan,
 Got: Xastiyam tenê ewe li we eyan.
 Ebû Talib vebîşirî hûre-hûre,
 Got: Kurê min, ew zengîne ji me dûre.
 Qelendê wê em nikarin tu car bidin,
 Nav êlê da emê çawa bisitirin.
 Bi xasteka keç Xedîca pir mêranî,
 Ev nikaha hate serî, bêkêr-me'nî.
 Ser hîmekî pirî qaîm mal çekirin,
 Herda hevdu pir hez kirin, bawer kirin.

Bi pêş, bê pêş, diçûn salên qence, xirav,
Emir dibû, behra kûre, bêqam, delav.
Hatin dinê şeş ewledê wane kubare rindik:
Qasim, Zeyneb, Gulsum, Êrqa, Evdile, Fatma nazik.
Pênc ewladê wan zû guhastin dinya xune,
Hezret Fatma bû hezkirya bavê xune.
Wî ji Fatmayê pir hezdikir, wek ruhê xwe,
Neda kesî, da Eliyê kur mamê xwe.
Nav wedekî pirî kin da ew nevsaxas,
Nava gel da gelek ra ew dibû nas.
Pira dikir, wîra hurmet, him temmene,
Hineka jî pêş wî dikir şer her deme.
Çiyayê Hîrê kevta sar da zikir dikir,
Pêş rebbê jor çok vedida, rica dikir.
Şev û roja dikir hîvî, iltîmase,
Digot: ya rebbem, bende bibin xwedê nase.
Gelek cara bê nan, bê av, tenê dima,
Boy hemûya diket nava fikra, xema.
Meşrûq jî wî disilikîn, dûr direvîn,
Rast hatinê rê ser wiya diguherîn.
Zarên piçûk hîndikirin, wan turziya
Wekî li wî bikin tinaz, rezîliya.
Wana carkê hinek kevir avîninê,
Nişkêva rûyê Mehmed hilda xwînê.
Edûyê wî zêde dibûn hezar-hezar,
Dixastin wî, armanca wî bikin bêzar.

Nevsa paqış hilnedida kes hesave,
 Riya xwe da dimeşiya ro û şeve.
 Car-carana dengên nenas dihatine wî,
 Derheq wan da Xedîcê ra digot ewî.
 Dema kete sala çilî ew nevs baş,
 Çiyayê Hîrê dengê hate, dengê xweş.
 Cem hazir bû Cibiraîl, melekê xas,
 Ayeta “Eleq” dayê, got, wê bibe nas.
 Got:- Bixwîne, ev ayeta rebbê jore,
 Mehemmed gotê, nexandîme, meke zore.
 Wî Mehemmed zexm givişî, him jî hejand,
 Ew ayeta dengê zîz, ewî xwe xwend.
 Mehemmed xof girt, îdî nehêvişand,
 Ew ayeta zû ezber kir, pê ra gihand.
 Wan zaxê da kirin, du rikat tev hev mêje,
 Xwe bû îmam, nehişt Mehemmed tişteke bêje.
 Dû mêjê, got: Ya Mehemmed, ferman heye,
 Rebbê jorîn tu bijartî Resûlê xweye.
 Ferman dike, îdî rabî, bikî kare,
 Pêş meşrûqa, minafîqa nebî xare.
 Dubar gotê, ya hebîbê rebbî ezîz,
 Cem rebbê jor, kesek tune wek te ezîz.
 Pêxemberê axir-zeman tenê tuyî,
 Bersîvdarê dînê Îslam ferqut tuyî.
 Emrê xwedê nav benda da biqedîne,
 Tew gotinên wî nav mejûya da bimehîne.

Mehemmed tirsîya, hejiya, him ricifî,
 Kete nava mitalê kûr, ne xalifî.
 Cibrayîl li Mehemmed pîr mêze kir,
 Emrê xwedê dubar wî ra tew qise kir.
 Got: - Zer, sipî, reş, hemû bendê rebbê jorin,
 Hinek hetev, hinek hurin, hinek jarin.
 Gotinên xwedê tu car meke, tu ji bîre,
 Bê emrê wî, qet tu meke tu tevdire.
 Berê bipîv, paşê bibir, hê birêje,
 Tu dûr here, tim merivên kîn, qirêje.
 Bê bawera rîya xirab vekişîne,
 Mucuzeta nîşan bide, nehêvşîne.
 Xwedê nasîyê têke nava dîl, mejûya,
 Mêj, taetê bike para tu hemûya.
 Qet nehêle kesek-kesî biêşîne,
 Bila her kes cezayê xwe, xwe bikêşîne.
 Cînet, cehenem malê wîne, fîrîqî çîye,
 Xêr û şera tîra wan da çî girtiye.
 Tu bi xwe çêke dinyayeke nûhe, aza,
 Kes, kesî ra meke dewa, meke doza.
 Benda bike bira, hogir, bîne cîkî,
 Bê emrê wî, kesek meke qet tişteki.
 Zorbe, zorê tu car mekin li hejara,
 Musulmanî, reh bavêje hemû dera.
 Wî daye te tew ayetê ulmê şerîf,
 Dinya fire, rehme xweye, paqîş, letîf.

Boy van gişka xwedê kirî Resûlê xwe,
 Daye te da hemû rusqet, kefîltiya xwe.
 Mehemed ayet Quranê da dicivandin,
 Cibrayîl çi dihanî, wî diqedandin.
 Musulmanî temam dinê wî beyan kir,
 Emrê xwedê dil, ruha da wî cî-war kir.
 Sivekê zû dîsa hate ew mizgevtê,
 Dixast bike tevî gişka mêj, taqetê.
 Rengekî xweş hingavtibû dêmê wiya,
 Nûra xwedê dibarî ji rûyê wiya.
 Gelek bûne ecêvmayî, man metele,
 Nizan bûn, çi qewimiye, ev çi hale.
 Dît, tew abid tenê li wî mêze dîkin,
 Gişk dixazin, vî halê wî jê pirs bikin.
 Eyan kir, şeva mehracê çi dîtiye,
 Nav xêybê da tevî kê wî hewal daye.
 Ew qewmandin yeko-yeko şirovekir,
 Çi dîtibû, şîrîn-şîrîn tew qise kir.
 Got: - Mîn dît, esman, heft qate, li ser heve,
 Her qatekî wekîlê wî wuyî bere.
 Qatê yekê, rûniştibû Ademê kal,
 Qatê duda Hezret Îsa, Yehyayî bal.
 Qatê sisya, lawê Yaqûb, Êsivê cindî,
 Qatê çara, Hezret Îdrîs min zelal dî.
 Qatê pêncê Hezret Harûn sekinî bû,
 Qatê şeşa Hezret Mûsa hêca dibû.

Qatê hefta Îbrahîmê rastî, helal,
 Hemû hevra diaxîfîn, paqîş, zelal.
 Ser sica da rûniştibûn, bikin taet,
 Emrê xwedê biqedînin, hêca, rihet.
 Ku ez dîtîm, temenne bûn tew pêş mine,
 Gotin: Qasidê xwedê îdî me dît çavê xune.
 Paşê çûme sîdîretul-munteqêye,
 Min li wî dît, nûr neder a yek xwedêye.
 Alem nava şemalê da dibiriqî,
 Xeybê deng hat, lê min wira kesek ne dî.
 Got: Resûlê, rind bibihê gotinên mine,
 Van fermanê min meke tu ji bîra xune:
 “Pênc ruket mêj bila bike her musulman,
 Evdê Salih li cinnetê bike mêvan.
 Qudreta min pareveke ser hemûyan,
 Bila bende min bawer kin, bînin îman”.
 Gotinên xwedê wî li tewa gire îzhar,
 Got: Wedeye, werin tev min em bikin kar.
 Em wê karê bikin riya tek xwedê da,
 Emrên wiya, bigihîne hemû benda.
 Rebbê jorîn bijartime resûlê xwe,
 Daye min da, hemû qudret, kefla xwe.
 Meşrûqa wî bawer nekir, heqyan, loqyan,
 Gotin: Ev çi serbaziye, bi wî kenyan.
 Ebûbekir bû baweriyê wî yekemîn,
 Xedîcê got: Mehemmed heqe, bînin amîn.

Paşê Elî, Omer, Zeyd bûn musulman,
 Bi emrê xwedê Mehemmed gelek kirin Îslam.
 Ew Xedîce bîst pênc sala jîn tev heve,
 Pirseke tel, herda tu car ne got heve.
 Mehemmed ra bibû heval, him piştovan,
 Car-caran meclîsê dîn da dibû mêvan.
 Didan gelek mislihetên aqil, giran,
 Riya ol da dibû feda, dibû qurban.
 Ku temam bûn şêst pênc salê wê xatûnê,
 Kesekî ra neda cefa, çû ji dinê.
 Qasîdê xwedê pir fikirî, him bû kasil,
 Got: Rebbê min, fermana xwe te kir hasil.
 Dem, qewmandin, tu car hevdu raçev nakin,
 Gelek hevra dibin heval, hev fehîm nakin.
 Aîşe dota Ebûbekirê sidîq bû,
 Pir aqile, pir bedewe, pilankêş bû.
 Piştî mirîna Xedîcê qasîdê xwedê,
 Aîşe anî Fatma ra hogir û dê.
 Ew, Aîşe heyşt sala jîn tev heve,
 Hevdu hezdikirin, timê diçûn teve.
 Sala heyşt, wan buhurî xêlek doze,
 Ew ji hevdu lez dûrketin, bê qereze.
 Helala dîn, bû Meryema cindî, nazîk,
 Boy wî anî Îbrahîmê bedew, rindîk.
 Îbrahîm, virnîtî guhast dina xune,
 Xênî Fatmê neman ewladên wiye dine.

Êvarekê Fatmê devra dîkir xare,
 Dît sekiniye, erebekî dirêj, jare.
 Got: Tu kiyî? Çima hatî, îro vira?
 Got: Qasidim, diqedînim emrê xeweda.
 Ban kir, bavo, mêvanekî me hatiye,
 Got: - Qiza min, destûr bide, bila bêye.
 Mêvan, selam da resûlê rebbê jore,
 Destmikerim, rûnişt hêla destê jore.
 Mehemed, ew nazkiribû, hê ber dêrî,
 Rind zanibû çima hatiye ewa merî.
 Hatina mêvan nehat xweşa qet Fatimêye,
 Tafilkêva hat guhastin rengê wêye.
 Bavê got: - Delala min, emir waye,
 Dane-stendin, hemû destî yek xudaye.
 Mêvan şikber dinihêrî valî, walî,
 Kes nedîbû, ewî weke vî delalî.
 Nizanibû, qet çi bêje, boy hatina xwe,
 Nav xema da berjêr kir bû wî serê xwe.
 Mehemed got: - Mêvanê min, meçe dûre,
 Rebe, biqedîne fermana rebbê jore.
 Mêvan rabû, xwe xuldirand, ne kir leze,
 Jor nihêrî, xwest îmdadek rebb bixaze.
 Resûl gote: - Ya mêvanê minî delal,
 Emrê xwedê biqedîne, nede mecal.
 Wê demê, Mehemed guhast dinya xune,
 Fatimê îdî mêvan nedît çavê xune.

632-ê mîladê, heyştê hezîranê çû mala heq,
Pêxemberî hat hildanê dinya neheq.
Emrê wî bû şêst sê salên tele-giran,
Pir edûya miqabilî wî weberdan.
Resûlê xwedê defîn kirin li Medînê,
Merzelê wî bû ziyareta tew Îslamê.
Ehlî Îslam fahte bidin ruhê çûya,
Silametiye tim bixazin boy hemûya.
Wê fahtê da navê Mehemed bila hebe,
Dergê xwedê pêş umeta wî tim vebe.
Pir pêwiste, her musulman qelbê temîz,
Biweklîne vê kelama rebbê ezîz.

Fatîhe

Bismîllahîrrahmanîrrahîm.
Elhemdûlîllahî rebbîl alemîn er-
rahmanî er-rehîm malîkî yewmid-
dîn. Îyyake ne'budû we îyyake
neste'în îhdînes-siratel musteqîm.
Sîrate el-lezîne en'emte elêyhîm
xeyrîl mexdûbî aleyhîm weled-
dallîn.

ÇAVKANİYÊN KU DÎ MEWLÛDÊ DA HATÎYE BÎKARANÎN

- 1.Evdil Hadî Botî. Emir jîna pêxemberê ûmetê Hezretî Mûhemmed. 1998.
- 2.Рамазан Авдаллы. Жизнь пророка Мухаммеда. Истанбул.
- 3.Osman Keskî oğlu. Hezreti peygamberin hayatı. Ankara, 1993.

WELATHEZÎ

KÎ BÛ SEDEM, WEKÎ EZ BÛME HELBESTVAN

Min derheqa dibistana gundê me û derheqa hogirên xweye zarotiyê povêsta xweye “Dayika Werdek û kevirê reş” da hûr gîlî nivîsiye.

Loma jî ez vê nivîsara xwe da, îdî wê derheqê da tişteki nabêjim.

Ez niha dixazim derheqa qewmanidaneke usa qisekim, kîjan ku wê qewmandinê heya îro ser dilê min rêçeke kûre ne bîrkirî hîştîye.

Destpêka koma yekê da hetanî kutakirina zanîngehê, min û kurmamê xwe Hesenê Rizgo tevî hevdu xwendîye. Em nav salên xwendevaniyê dirêj da rûniştandinokê da rûniştine û ji hevdu qet ne qetyane. Loma jî, em hevdu heta îro jî çawa kurmam hindikî nas dikin. Lê çawa hogirên hevdu hevra hurmet û siyaneteke mezin dikin. Em nav emir da rastî gelek qewimandinên biçûk û mezine ne bîrkirî hatine. Hejmara wana jî hesava dere. Ji wan îdî gelek hatine bîr kirinê. Lê usa qewimandin hene, ew qet nayê bîr kirinê, temamiya emrê te dibine hogirên teye şev û roja. Tevî te jî diçine dinya heq.

Ez salekê bera wî hatime dinê. Milê xwe va hinekî ji wî qewettir bûm. Lê hemû karên mayîn da ez gelek cara hewceyî wî dûbûm.

Ew jî min merhemettir û xebatheztir bû. Çi şuxul bêjî destê wî dihat. Lê ez xwandin û werzîşê ra mijûl dibûm. Ev qewmandina ku ez hildidim qelama xwe ew ber çavên wî

qewimandiyê. Wê qewmandina boy mine ne bîrkiriye. Diqewime nika ew bîra Hesên derketiye...

Me li koma hevta da dixwend. Ça dibêjin, îdî hinekî xwe dipijîland, ser guhên xwe badikirin.

Rojeke dersdarê meyî dersa edebiyatê Necef Şamemmedov piştî dersa, em beravî dersxane kirin. Derheqa rabûn, rûniştandin, tore û merîfetê da me ra xêleke xurt axivî. Dawiyê hate ser armanca xweyê pêwist.

Got: - “Gerekê hûn bi qeweta xwe, vê hejmara rojnama diwêre bi sirê binivîsin. Wî ew rojname timê xwe amade dikir. Wê ra neynika sinifê digotin. Çimkî wê da derheqa hemû zarên ku sinifê da dixwendin. Her cure qise vedibûn. Her zareke sîfetê xwe wêda didît. Loma jî me gişka jê wê hez nedikir. Îlahî jî hogirên meye xirav xwendî kêmasiyê xwe tê da didîtin. Dersdar hemû nivîsar û şiklên ku hejmarê da bihatana weşandine ser zarên sinifê parvekirin. Pêş navên wana bi nivîsar kifşkirin. Dawiyê ez û Usivê havalê min man. Wî xêleke xurt li me nihêrî, kenîya. Got: - “Hûn jî gorî qewata xwe her yek helbestekê binivîsin. Bila wêda, sîfetê hogirên weye xirab xwendî bê xuyakirinê. Ezê helbestên we bixwînim, ya kê xaşa min hat, ezê wê rojnamê da biweşînim”.

Wede tamam bû, me hemûya nivîsarên xwe teslîmî dersdar kirin.

Rojekê, wî em dîsa beravî oda dersxane kirin. Nivîsarên me nîşanî me dan. Derheqa kêmasiya wan da kurt xeberda û fikra xwe got. Kengê dor hate min û Usiv, wî dêmekî geşa bi ken li

me nihêrî. Got: - “Usiv, kurê min, rast bêjî ezî derheqa te da fikreke mezin da bûm (wî ji temam dersa qîmetê pênc distendin). Lê nav halbesta te da min, ew ne dît. Ezê rojnamê da helbesta Barî biweşînim”.

Usiv hinekî sero-marî bû, serê xwe berjêr kir. Derbekêva bikind kenîya. Dersdar sebebê kenê wî jê pirsî.

Wî got: - “Hevalê dersdar, ezî gelekî şame, wekî helbesta Barî xaşa we hatiye. Ne wî ew helbesta zimanê me nivîsiye. Lê ew feqîra çî bike. Ka zimanê wî da çî heye wekî ew binivîse. Qet wî zimanî kesek jî nas nake. Bila binivîse, bila bi seya zimanê me xwe ra cîkî bigre”.

Ez ser vê gotina Usiv ecevmayî bûm. Rast bêjî, min hetanî wê rojê qet nizanibû, wekî ez miletekî cudame. Me hemûya tevî herdu dixwend. Herdu ra hevaltî dikir. Nolanî bira hevdu hezdikir.

Wê gotina wî, ez çawa bêjî ji xewa hinkorê rakirim. Min wê rojê sond xwar, wekî ez zimanê dayîka xwe rind bixwînim, rind hîn bibim û bibime helbestvan.

Qarê hevalên ne baş ez kirime helbestvan. Îro ez helbestvanê kurda dinyayême. Loma jî ez ji hemû dayikên Kurd hîvî û rica dikim, hema dema destpêkê da zarokên xwe ra tenê zimanê Kurdî biaxifin. Wan bin lorî-loriyên kal û bavên xweye şîrîn da bidine razandinê. Bin wan loriya da ji xewe şîrîn hişyarkin. Wana nav mejûyên zarên xwe da bidine mehikandinê. Dawiyê bila zar xwe çawa Kurd nas bike. Zimanê xwe paqîş, zelal hewalde û wî bihebîne.

Bila zimanê dinê jî bizanibe. Beriya gotiye: “Çiqas zimana bizanibî, tu ewqas meriyî”.

EZ TU KESA NABİM RAZÎ

Neyarên me nexenqînin,
Welatê me dernexînin,
Hêlîna wan nehedmînin
Ez tu kesa nabim razî.

Dibistanên me venekin,
Gund-bajarên me şên nekin,
Derqa gelên min venekin,
Ez tu kesa nabim razî.

Xwînrejên me nekin wek mû,
Hemû mala hilnekşe dû,
Ewq-şa nebin hemû dêm, rû
Ez tu kesa nabim razî.

Top-tivînga nehelînin,
Rê û dirba nekişînin,
Xwînaxarên me ne hecqînin,
Ez tu kesa nabim razî.

Xort, keçika nekin gazî,
Nexemilîn, sêwiyên tezî,
Bask venekin teyrên bazî,
Ez tu kesa nabim razî.

**ELÎ, KURÊ MÎN FÎKRA MEKE,
XWEDÊ YEKE, DERGÊN WÎ HEZARÎN**

Rewayî mirovên bedesle, bê îtîbar dikim.

“Teze hatin, kevn xelatin” got beriya,
Esil xirav zû bîr dike hemû qenciya.
Îşqa çava bidî wî da, diçe bade,
Birçî bimrî, parî nanê xwe tera nade.
Ça neyarek, wê te têxe nava piya,
Wê pîr şabe, te bişîne ber deriya.
Wedê rûte, wiya meke hemêza xwe,
Pûrt ku lê hat, wê te rake derziya xwe.
Îtbara xwe qet pê neyne, xwe qorîke,
Dergê wiya cinnet bê jî, tu venake.
Wê xwe heyfke, wekî tu wî bihebînî,
Xêr-qenciya tu cara ji wî nabînî.
Fita wî hat, tu bibînî, meriv nîne,
Wê şerm neke, tew rezîlya bixevtîne.
Te dît kute, mesekine, zû bireve,
Nêzîk nebe, bîna wiyê li te keve.
Sivrekê da cem rûnenê, tişt nebêje,
Go mê dêda, çi dibêje, bila bêje.
Wê nolî sa ewte-ewtke, xwe bikeve,

“Zane ewe” şuxulê te pê nekeve.
 Pêş merivên qulix bilind, wê xwe mêlke,
 Dibe tejî, dila xwe çep, rast wê bake.
 Reha wî da qencî tune, xêynî xirav,
 Behra wiya mewt û jere, agir, alav.
 Armanca wî dew û dozin, edil nîne,
 Tim dixaze, hemû qut bin, ew bimîne.
 Boy nefa xwe, wê namûsa xwe bifroşe,
 Xelberava nan tev buxî, dawî boşe.
 Çavnebarî, kîn dexesî pera wîne,
 Xwîna wî da xwîna meriva, qet tu nîne.
 Pêşyê diçî zexm gez dike, dû xwe çivta,
 Hewal dide, jê dibare qetil, xeta.
 Giliyên sed sal bîrê naçin, diweklîne,
 Hemû cem wî yekîn, nahêvşîne.
 “Pismam” tenê derheq hûrê xwe difikire,
 “Nisla wiya” hemû nisla zêdetire.
 Şev ranazê, ax-of dike, heta sibê,
 Mal û milka dişewtîne, dide badê.
 Hebûna wî reziliye, kîn û mekre.
 Emrê xwe da wî ne dîtiye mêj û zikre.
 “Kî derxare, wî ra ware” armanc ewe,
 Kesê usayî dewakar be, jê bireve.
 Mirovên usa dûrbe, dûrbe, tu lawê min,
 Namûs, xîret, ser bilind be, tu kurê min.

EZÊ HEMÛYA BÎBÎM RAZÎ

Dinê gişkî bidine min,
Ezê bikim hewar, gazî.
Zimanê min mekin unda,
Ezê hemûya bibim razî.

Kî bûna min înkâr mekin,
Kan, xeznên min talan mekin,
Dergê xêrê li min vekin,
Ezê hemûya bibim razî.

Zindan, hepsa kilît bikin,
Çek-sîlaha hûrxaş bikin,
Azaya min pîroz bikin,
Ezê hemûya bibim razî.

Sînorê kevn teze bikin,
Navê gelêm qebûl bikin,
Dost-bratîê min ra bikin,
Ezê hemûya bibim razî.

Dilê minî kirine çar par,
Bizelqînin, bikin yek par.
Ji vê dinê bikim firar.
Ezê hemûya bibim razî.

HEYFA XWE BÎSTÎNÎN

Tew dîroka tînim pêş xwe, dubar, dubar mêze dikim,
Belgê qurna yeko-yeko weldigerînim, teze dikim.
Ber çavên min dibin dûman, dil-hinavên min dihejin,
Mitheyr dibim, qet nizamim, ku destpêkim, ji çi bêjim.
Jan û êşên min ra hatî, jimarêva nabin kuta,
Xuliqîme, qismetê min timê bûne jan, êş, xeta.
Nav van qurnên bê îtbar da, ez ne keniyam, ne jî şabûm,
Rebbê jorîn tew gela ra pir ruza da, ez bêpar bûm.
Ser serê min venekişyan tavî-teyrok, qetil, tofan,
Merezê min bûn merezên bê tebîbe, him bê loxman.
Heyam birin, kadam xwarin, roj şevên min reş xemilîn,
Kesek li min nebû xwedan, deşt-zozanên min qimilîn.
Bûm kolekî bê cî, bê war, bê rusqetî, him sergerdan,
Min serê xwe ku bilind kir, qotê min da kulma lêdan.
Dîroka min tew reş kirin, gotin awa tu gel tune,
Ne karife, ne bûdîste, ew qet ne jî musulmane.
Bavê girtin, birê kuştin, naz-bedewê xwe ra birin,
Xwînam kişiya, bû cem-kanî, welatê min xirav kirin.
Mirovên dinê ker bûn, kor bûn, man bê ziman, tişt negotin,
Ser axa min bazar kirin, ew him kirîn, him firotin.
Qurna bîsta tew kuta bû, em dîsa man vî halî da,
Neyarê hur zumla ser me ne sivik kir, ne jî hilda.
Zarê şîrîn em xapandin, me şev-roja ew bilind kirin,

Heta em ji xewa rabûn, wan navekî nûh li me kirin.
Wan me ra got, ey têrorîst, mekin denge, mekin hese,
Ew jiyana me daye we da, wera ew jî îdî bese.
Heta kengê emê bijîn, bin vê tirsê, bin vê xofê,
Ez hilnedim, hûn hilnedin, kiyê hilde evê heyfê.
Rica dikim, dem hatiye, bibine yek, xwe nedin paş,
Xwînxwar altkin, heyfê hildin, ro-rozgara wan bikin reş.
Welatê me aza bikin, bila şên bin gund û bajar,
Vî emrî da hinek şabim, rojên mayî nebim bêzar.

KÎME, EZ!

Kalêm Kawe, bavêm Rostem, birêm Memê,
Pîram Xecê, daykam Eysê, xwîşkam Zînê.
Nolî gişka ez jî hatim, evê dinê,
Bûme kole, dihecirim, têm kuştinê.

Çavêm Herîr, dilêm Feqî, zarêm Xanî,
Rebbê jorîn xuliqandim vî mîkanî.
Gur, hirçên har her çar hêlan min ewirîn
Dil-hinavên min veçirîn, kirin birîn.

Serêm Agrî, bejnam Zagros, milêm Sîpan,
Mejuyê min Şêxmûs, Hejar, Koyî, Goran,
Serokê min Qazî, Berzan, şêr Ocelan
Daykam dane hezar-hezar buke, beran.

Amed, Hewler cot birane, ruhê minin,
Dicle, Fîrat herd bistanê dayka minin.
Welatê min hêlek deşte, yek zozane,
Şan-şerefam, tenê-tenê Kurdistane.

Diroka min veşartine, kes nebîne,
Lel-dure min tew birine, nehîştine.

Mirvên dinê kor-lal bûne, tişt nabêjin,
Giliyê dawiyê xwînxwara qet nabêjin.

Wekî wa be, wê ça bibe tew halê me,
Qet keseke neseke li piştê me.
Bextê Kurda, Kurd gereke xwe hel bike,
Serê neyar, bi destî xwe xwe qut bike.

Serokê me Îmrîliyê nav behrê da,
Ev deh salin, te destê xwe daye ser da.
Mala min da min dikujî, dizêrînî,
Bê şerefî, dê-xwîşka tu nahêvşînî.

E, bê bexto, ser wî guhî qet ranezê,
Kan-xeznên me talan neke bayê bezê,
Çi kiriye, îdî bese, derê here,
Te şîrê gura mêtiye, me vegere.

Sond veduxun, li ber dergê rebbê jore,
Şikir îdî gihîştiye me jî dore.
Firsend hatiye, fitê nadin em ruhê te,
Welatê xwe, emê derxin ji destê te.

KURDÎSTAN

Bextewarim, tu welatê minî,
Germ hêlîna kal û bavên minî.
Ruhê m nabe tucar ji te dûre,
Pêş min sistin, derge, dîwan, sûre.

Ez heyrana nav û dengê te me,
Kesera kesk, sor, zer ala te me.
Xwezil, min maçkîra her kevîrên te,
Dilê min da nema hesreta te.

Beravkîra hevek qîş-qalê te,
Runîştama piçek ber agrê te.
Sihkîra xwedî welatîya xwe,
Duqat bûma yekcar ber rebbê xwe.

Welat, dayîk weke hevîn, got beriya,
Qaîm bigrî, qet nakevî ber deriya.
Wekî sist bû, tuyê welêt bidî dere,
Hemû gelê te nas bikin xwelî sere.

Destê tenê deng jê nayê berê-berda,
Wedê du dest hev dikevin, deng tê herda.
Yekbûn timê neyarê har dixenqîne,
Tenê ew gel koletiyê derdixîne.

Ewladê te tew bûne yek, şikir îro,
Pişt kutane pişta hevdu, nabin gîro.
Wan hêsrên te wê paqîşkin, sedî, sed car,
Ezê bibim mêvanê teyî şa, bextewar.

BÎRANÎN

Bîranîneke ne bîrkirî derheqa rêwîtiya min û nivîskarê Kurdî eyan Ahmedê Hepoye 1995-ê li Asya Navîn û komara Qazaxistanê da.

Fesla payîzê bû. Serekvaniya komara Azerbaycanê ez û Ahmedê Hepo boynet xizmeteke resmî şandine komara Qazaxistanê. Em bi firinda dewleta Azerbaycanê hatine firindegehê Qirgizstanê. Wedê em ji firindê peya bûn, polîsê nobedar, çawa rêwiyê din usa jî kaxetên me nihêrîn.

Bi maqûlike gelekî bilindva em hetanî ber derê firindexanê anîn. Me ra oxura baş xastin. Me hevdu ra Kurdî xeber dida. Vê demê du zilamê Kurde berbiçav nêzikî me bûn. Selam dan. “Hûn ser çavên me hatine”, gotin. Me şikirbûna xwe anî wekî em vira jî rastî Kurda hatin.

“Yeqîn we ra erebe pêwiste”, gotin. Me “belê” got.

Wan zû tirimbêla xwe anîn. Kel-melên meye rêwîtiyê tê da cî war kirin. Em tirimbêlê da dane rûniştandinê. Berbi bajarê Bişkêkê leqyan. Nav xebordanê da kîbûna me pirsîn. Me xwe da naskirinê. Ewqasî jî rêaksiya ne dan. Tenê derheqa halê xweyî aborî da qise kirin.

Wan em xêleke xurt nav bajêr gerandin. Ber avayîkî pênc qatêyî kevn sekinîn. “Keremkin, peya bin” gotin.

Me çavê hervdu nihêrî. Kîno, lez ji erebê peya bû. Kel-
melên meye rêwîtiyê jê derxistin. Bêşerm-bêşerm vebişirî.
Heqê anîna xwe ji me xast.

Min diravên Azerbaycanê dirêj kirne.

Ew kenîya: - “Apo, soma bide, soma”.

Min got: “Lawo, me piyê xwe hê daniye ser axa
Qirqizistanê. Em soma ji ku bînin?”

“De wî çaxî dolarla bidin”.

Min sed dolar ji berîka xwe derxist. Dirêjî wî kir. Wî dolar
zû ji destê min hilda, demekî geş min nihêrî. “De bi xatirê we
got” dîsa berbi firindegehê leqîyan. Em ecêvmayî man. Me
xêleke xurt dû wana nihêrî. Lê îdî dereng bû.

Ahmed pejmûr-peşmûr serê xwe ba kir. Zarekî paqîşî letîf
va kêlimî: “A, ev jî kurên milletê me...” Paşê zêde kir: “Bariyê
bira, goşt bê hestû, daristan bê hovî nabe. Nav her milletî da
yê qenc jî hene, yê xirav jî. Millet bi nevsêkê va gerekê nayê
naskirinê”.

Min derheqa merîfeta wan herdu zîlamên “baş da” ev
helbesta nivîsî:

Firindê em axa Qirqiz peya kirin,

Sînorvana kaxetên me mêze kirin.

Bi rêzdarî ji balafirgeh em derxistin,

Serfînyazî oxura baş, me ra xastin.

Ewê demê du lawên Kurd me peyda bûn,

Apo, xalo, gotin, kenîyan, şa bûn.

Ereba xwe pêşda anîn em suwar kirin,

Kirne qîrîn, ber Bişkêkê rikêf kirin.
Hêdî-hêdî ji me kirin pirs, hewale,
Xastin hînbin, ewira me kîjan male.
Me Huseyn got, hev nihêrîn, lêv hilkirin,
Torin, Îşxan, dûrva, durva kêr naskirin.
Kîbûna xwe me beyan kir, deng nekirin,
Derheq halê xwe da şewat qise kirin.
Nav Bişkêkê kolan-kolan em gerandin,
Dewsa soma, sed dollarek ji me stendin.
Hev nihêrîn, bêşerm-bêşerm bilind kenîyan,
Dilekî eşq riya xwe da dîsa meşîyan.
Ahmed hêrs bû, mitheyr, pejmûr got û biland,
Pey wan “mêrxasa” nihêrî û serê xwe hejand...

QULÎNG DÎSA DÎQÎRÎNÎN

Bahar hatiye, quling tene berya jêre,
Dîqîrînin, nîzam şere, yanî xêre.
Hîvî bikim, pêşikêşê refê wane,
Cîkî daynin, qasek bibin min mêvane.
Pîrs bikim, çima hatine vî welatî,
Kê ew kirine çol-çolistan, evî semtî.
Ser Qendilê, Avaşînê, Zagrosê gir,
Derbaz bûne, çi dîtine, çe hebû wir.
Dema refê wana danî besta fire,
Nêzik bûm, ji wan bikim pîrs, pîrsiyare.
Qulingekî min niherî, hate ziman,
Got: “Min mêzeke, min bibihê, ey helbestvan,
Wedê cem me diwerixin, rez û xurme,
Bendê xirav, me derdixin welatê me.
Îcar dîsa ji me stendin xurme, reze,
Wan zalima em derxistin lez û beze.
Rica dikim, tu halê min mêze bike,
Melhem bîne, birînên min derman bike.
Paşê ezê tew dîtînên xwe qisekim,
Hal-ehwalê welatê te şirovekim.
- Dema ketin em esmanê Kurdistanê,
Li me zorkir sur û serma zivistanê.

Dengê boma hingavtibû çiya, banî,
Hemû hêla dihat nalîn, him zêrînî.
Berfê peçinî bû, parek welatê te,
Bê piştovan mabû dîsa tew gelê te.
Dozê pêştir, me li wira tişteke ne dî,
Sexîr, sêwî, bela bibûn hemû alî.
Ser me da jî bê heq barîn bombên xwînxar,
Pî, baskên min, li wir bûne wa birindar.
Xwest avê vexun, cema da xwîn dikişiya,
Xwest qût hildin, asîman da jehr dibariya.
Gotinên quling dil-hinavên min helandin,
Her çavên min hêsirên şewat berjêr şandin.
Kasil-kasil bangorî bûm rebbê jore,
Tew xwînxara, ji textê wan bîne xare.
Hevekî, sî-sitara xwe bide ser me,
Were rehmê koletiyê xilazke me.

DERHEQA DAYİKA MÎN DA

Dayika min, Qaza Evdoyê Bişo, evdeke pir milahîme, kedkare û merivhez bû. Endamê qebîla me, hemûya wê ra qedir û qîmetekî pir mezin dikirin. Van paşwextiya zarên qebîla me gişka wê ra “pîrkê” digotin.

Her gelekî anegorî wî, erf û edetê wiyî milletî û gelirî ne bîrkiî heye. Endamê wî gelî ewladên xwe bi ruhê wan erf û edeta va tore dikin. Hîmê emrê wanî paşeroja ser wan bingeh datîne.

Ji wan erf û edeta yek jî ewe, wekî malêkê da çiqas zar hebin, dê û bav nav wan zara da yekê gelekî hez dikin. Çawa beriya gotiye “Berê beroşê timê berbi wî dikin”.

Wî edetî mala me da jî hukmê xwe diajot. Wê zarê ra “ser gulikê malê” dibêjin.

Diya min û bavê min gelekî ji min hez dikirin. Ewana kuda diçûn timê ez bi xwe ra dibirim. Wedê xurekekî baş dihate mala me da para min, ji para gişka gelectir dibû. Kîncê baş timê min xwe dikir... Loma jî min ra “ser gulikê malê” digotin.

Bavê min Eliyê Paşayê Muho 1943 salê çû şerê cihanîyê duda. Pey wî ra dayika min û birê minî mezin Mehemmedemîn ew xastina bavê min bîra xwe dernexistin. Ew timê ser min dixeliyan, diceliyan, wekî ez tu tengasiyê nekşînim. Qet bîra min naçe, wextê ezî hevt salî bûm, diya

min goreke rîse çend renga boyaxkirî min ra çêkiribû. Gelek nexşên cure-cure lê kiribû. Saqa wêye dirêj bû. Rûyê serva şiklê guleke sore mezin danîbû. Jê ra gora “Qizil gul” (“Gula zêr”) digot. Wedê wê gore kire piyê min, xêleke xurt li min û gorê nihêrî. Kesereke kûr kişand. Pê deyla mêzera xwe, hêsrên xwe paqîş kirin. Bi dengekî kewgirî, ev çar rêz mînanî kilameke heznî hêdî-hêdî lîland:

Tew bibînin, gora Bariyem “qizil gule”,
Min çêkiriye çavên hêsir, tiliya kule.
Kekê kurêm vê oxirê ku vegere,
Kurê minê, bi vê gorê pêşva here.

Telebext ra bavê min îdî ji wê oxirê venegeriya. Ez jî bi wê gora xweye “qizil gul” va pêş wîva ne çûm. Ew hemêz nekir. Herdu çeplên xwe stuyê wî ne alandin û ew têr-têr maç nekir.

Nika ez wan çar rêzê ku dayika min gotine, tînime bîra xwe. Derbazî ser kaxet dikim. Dilekî pir şewat dubar-dubar, awaz-awaz dixwînim. Tême ser wî qinyatî, wekî nava ruhê dayika min da jî nişa helbestvaniyê hebûye. Ewê nava şîrê xwe da, ji xwexezna lel û dure nemirî hevek jî daye min da. Loma jî ez bûme helbestvan.

Nika ez pêş dayika xwe bejna xwe ditewînim. Dibêjim, hezar-hezar rehmê li te be. Bersîva wêya awa didim:

Ji te mestir kesek tune,
Wek te şîrîn, tu tem tune.
Hemêza te heq cinnete,
Wek wê cinnet, tu cî tune.

2009

MIN Û HÎVÊ HEVDU MÊZE DÎKÎR

Îşev şeveke çik-saiye, pîr zelale,
Rûniştîme oda xwe da pîr bê hale.
Bînber hemû çûne xewa hingorêye,
Hêsa dibin, sibê herne kara xweye.
Ji tu hêla nayên ne deng, ne jî hese,
Hayên xanê ne tu inse, ne tu cinse.
Car-carana tên guhên min banê dîka,
Biqe-bîqa ruviyên birçî, dengên seka.
Perperok xwe nav şama da dişewtînin,
Hebûna xwe tenê wê da ew dibînin.
Tebîet jî nakêlime, seqiriye
Valayike bê hed-hidûd xulîqiye.
Mitalê kûr bûne hogir min bernadin,
Dikim razê, venakişin, min dûr nabin.
Tên pêş çavê dê û xwişkên cilê reş da,
Şîn-giriyê bûkên xemle ber perda da.
Zêre-zêra pîr dergûşên ber bistana,
Hêwirzeyên quloz dibin goristana.
Tanq, teyarên aham dikin kaf û kûne,
Çima bendek, evê zulmê qet nabîne?
Hîv dizî min, pencerê da mêze dike,
Dixaze, bibe dostî min, culet nake.
Ew jî zane, ezî jî wê gazinkarim,
Boy kirinê wê, zûda wê ra dewekarim.

Neyarê wê tarîstane, zû qut dike,
 Neyarê me gurê gewre, wî ar dike.
 Ronaya xwe digihîne nivê royê,
 Xwînxwara nîşan dide ew timê rê.
 Tev wan diçe, hemêza xwe dide wane,
 Dihebîne, geş dikene rûyê wane.
 Ber Qendilê, Avaşînê, wan pê dike,
 Tîrêjên xwe bere-bere zêde dike.
 Ah, nalînên birîndara ew nahese,
 Ber defîka xwînxarên me direqise.
 Tave hîva ser wan nake tarîstane.
 Nakêlime, qet venake zar-zimane.
 Boy kirinên wê, ro, sterka ra min gazin kir,
 Royê qet ez ne bihîstim, go min nekir.
 Hemû stêrka min kir hîvî, pir minete,
 Ji wan caw hat, ew me dûre, ew serbeste.
 Ez wan îdî dost nizanim, nehebînim,
 Yalê wan da tu qenciya nahêvşînim.
 Lê ez li kê bikim rica, îltîmase?
 Bêje, xeza nekin, ewî gelê xase.
 Min dît, wekî ezî şaşî, xalîfîme,
 Tewyam, xar bûm, çok veda ber rebbê xune.
 Tew xastina tenê ewa hasil dike,
 Hemû derda tenê ewa derman dike.
 Got: Ya rebbêm, eme timê hîviya te ne,
 Were rehmê, em jî sefîl, bendê te ne.

HESRETKÊŞÊ TE ME, WELAT

Tim dinalim, tim dizêrim, boy te, welat,
Bê piştîm, bê pargalim, dûrim, welat.
Him sêfilim, him sêwime, bê par, bê war,
Dayika minî, ez ewledê te me, welat.

Şeref, namûs, zar-zimanê minî, welat,
Sûra hesin, sî-sitara minî, welat.
Wek te bilind, wek te şîrîn tişteke tune,
Gula bînî, ez gulvanê te me, welat.

Hêlîna germ, cî û mekan, qulba minî,
Qedir-qîmet, sebir-tawet, rewşa minî,
Tu zemzemî, tîverîkî, boy tew Kurda,
Şev û roja hesretkêşê te me, welat.

Tim rêwime, te digêrim, nabînim te,
Him direvim, him debezim, naghîjim te,
Xalî nabin, herdu çavê av û hêsrâ,
Merez kirim, tengezarim, dilêşê te.

Xwezil carekê min bask veda esmanê te,
Hevek aza bimeşyama ser axa te,
Hemû xwînxar hemêza te derketana
Berî gişka pîrozkira min cejna te.

EZ ŞA NABİM, NASEQİRİM

Batman, Cizir, Wana rengin,
Deşta Mûşê, êla Şamzîn,
Qers, Qaqizman, şêr Efrînê,
Ûrfa, Bidlîs, him Mardînê,
Aza, rihet, ez nabînim,
Ez şa nabim, naseqirim.

Bazîd, Mereş, Ameda rewş,
Ûrmîyayê, Çewlîka xweş,
Hewlêr, Zaxo, Qendîla geş,
Qelfe-qelfe, dotên zulf reş,
Şa, bextewar ez nabînim,
Ez şa nabim, naseqirim.

Silêymanîyê, tew Kerkûkê,
Selaheddînê, rind Dihokê,
Şaxê gelîyê Elî begê,
Çiya, baniyên dor kêlekê,
Bê dew, bê doz, ez nabînim,
Ez şa nabim, naseqirim.

Geliyê Zîla, Sipanê sar,
Agriya kal, Zagros, Kebar,

Zozanên mane bê zom, bê war,
Keç û xortên kawê, kubar,
Deste-deste, lê nabînim,
Ez şa nabim, naseqirim.

Derê mala dîlan, şaya,
Dergûşên têr, milê diya,
Dibistana hemû ciya
Köçervana sîngê çiya,
Têr û hetev ez nabînim,
Ez şa nabim, naseqirim.

Asîmanê çîkî-sayî,
Teyrê bazî bask berdayî,
Teyrik, tûyên welêt mayî,
Kar-xezalên terh vedayî,
Be tîrs, bê xof, ez nabînim,
Ez şa nabim, naseqirim.

Mexmûr, Musil, Avaşînê,
Şeqlevayê, Xaneqînê,
Qamûşliyê, him Serdeştê,
Dê û bava seyran, geştê,
Tev kur, bûka ez nabînim,
Ez şa nabim, naseqirim.

Gêrîla çiya berjêr nebin,
Girtîxane vala nebin,
Stûnê sînorên me her derê,
Bilind nebin, dewsa berê,
Rast-heqiyê ez nabînim,
Ez şa nabim, naseqirim.

Dicla têrav, Fîrata lal,
Mûradê hêrs, Erezê qal,
Kal û pîrên bê şûn, bê mal,
Tew piçûkên nazik, delal,
Nav şaya da ez nabînim,
Ez şa nabim, naseqirim.

Sond duxum, zûrya Mehabadê,
Helebca heland, bombên mewtê,
Încîl, Quran, bi Tewratê,
Mala neyar ber mîratê,
Çavê xwe va ez nabînim,
Ez şa nabim, naseqirim.

Dinya alem pêroz meke,
Xwedê derga me venake,
Sêwî-sexûr, tew şa nebin,
Gund, bajarên min şên nebin,
Yek Kurdistan ez nabînim,

Ez şa nabim, naseqirim,
Ez şa nabim, naseqirim.

BAVÊ MÎN BÎRÎN

*Rewayî şahîdê şêrê cihanêyî duda, bavê xwe Eliyê Paşayê Miho
dikim.*

Wedê cawa nevxêriyê gihîşt dinê,
Şîn û girî kete mala nîv havînê.
Benzê benda hat guhastin tafilkêva,
Ça masîkî bigrî, derxî, ji nav ava.
Ewq û şayî îdî temam bûne unda,
Qîrîn, qûjîn kete nava bajar, gunda.
Mirovên do, pêr, ji wan dihat bîna enper,
Îro, îdî wan dibarî xem û keder.
Hemû bînber ciyê xwe da tevizî bûn,
Merg û çîman, xas baxçê ter çimlisî bûn.
Kuzrî bûn gul-kulîlkên gulistana,
Dadiweşyan fêkî-rezê daristana.
Ewr-esmana zelûl-zelûl fikir nalîn,
Kew-bilbila nedikir kakîn, ne jî galîn.
Dapîra min rûniştibû, li ber kuçik,
Hêsrên şewat dibarandin piçik, piçik.
Bavêm li me, herd xanima mêze dikir,
Keserên kûr, ser kesera teze dikir.
Boy wî îdî ne hîv, ne ro nediçûn ava,

Pejmur, pejmûr dinihêrî li me tewa.
 Şeş salî bûm, pey dayika xwe direviyam,
 Bavêmin birin, min kir qîrîn, him jî giriyam.
 Çend roj şûnda jî gundê me gelek birin,
 Dê û xwişka îdî cilê kevn xwe kirin.
 Heya bavêmin ku hîştibû, gişk zîqa bû,
 Gundê me da hindik mal man, ew bela bû.
 Bê kurtiyê dapîra min gelek kar kir,
 Naliya, zêriya, dinya ronî wê zû bar kir.
 Du birên min, Baqî, Torin birçî delyan,
 Kerb li wan ket, heta em bi wan hesiyan.
 Agir dibarî, dişewitîn erd û ezman,
 Brîndar dihatin, bê dest, bê pê, bê zar-ziman.
 Namên sê qulç dikişîyan nolî avê,
 Kes nizan bû, çiyê bibe, heta sibê.
 Sewîxane tijî kiribûn, sexîr-sêwiya,
 Gelek tîfal diqerisîn serê riya.
 Mala dihat dengê girî, qîrîn-qûjîn,
 Dê û xwişka por û qulî vediçirîn.
 Rojekê jî nama sê qulç hat mala me,
 Wê rojê da şîn û girî ket nava me.
 Em bûn sêwî, birçî-tezî, bê cî, bê war,
 Kesek li me nebû xweyî, ne jî sitar.
 Mehmedemîn rûnişt dewsa bavê xune,
 Serwêrî kir, dê û bira, xwişka xune.
 Rojên şewat, rojên giran, hatin û çûn,

Şer xilaz bû, gelek giriyan, hindik şa bûn.
Em bûn bav-dê, him ji xudan mal û ewlad,
Nava gel da em bûn xudan qedir-qîmet.
Daykam timê pir digerland, him digiriya,
Boy bavê min, mîna mûmê diheliya.
Rojekê jî, wê ez birim oda xune,
Danî ber min, xurca cihêzê xune.
Kembereke zîv jê derxist, wê da mine,
Got: - Lao min, îdî wedê çûna mine.
Ev nîşana bavê teye, hilde ezîz,
Tu jî wêya bide lawê xweyî ezîz.
Ev papaxê bavê teye, nede kesî,
Wî rind hilde, nîşan nede qet tu kesî.
Wedê ku te ez danîme mala heqe,
Rica dikim, tu ewî jî tev min çel ke.
Pir nekişand, daykam guhast dinya xune,
Min weysêta wêya qedand dilê xune.
Buhurîne gelek salên tele, giran,
Venegerya bavê minî şêr, pelewana.
Maç-mehezên wiye şîrîn min ne dîtin,
Riya wî da ked-xizmetên xwe nerêtin.
Nav lawa da kubar-kubar ew ne meşiya,
Mînanî min, mehez nekir serê neviya.
Bavim, hemû bava dikim îltîmase,
Hevra bikin biratîke bê kîn, tirse.
Ew rojana, ewledê we qet nabînin,

Top, tivinga, bombên jehrê ne xevtînin.
Erd rihet be, erşê-ezmîn bibe sayî,
Hemû bende li axa xwe bibin xweyî.
Zar tew bijîn, şa, bextewar, bi bav, bi dê,
Dost, aşîtî per bavêje temam dinê.
Por weşyaye, pişt xar bûye, diran çûne,
Şikir xwedê, neviya dora min girtine.
Riya bavê xwe dinihêrim, nayê xanê,
Nele tînim, tew xwînxarên wê dewranê.

GELÊ KURD, DEM HATÎYE

*Rewayî hilbijartinên şaredariyê ku wê 29.03.2009-ê li Turkiyayê
bêne derbaskirinê dikim.*

Mer dimîne, timê mere, xeysetê xwe ne guhere,
Erdoxanî qetilkare, hebûna wî delke, şere.
Xwînxar îdî merixiye, rûniştiye, li ser çoka,
Firsenda xwe dest bernedin, ji cî rabû nade heqa.
Hevikekî bifetilin, riya hatî binihêrin,
Gotinên wî bawer nakin, qenc û xirav hev bibijêrin.
Golê xwînê, goristana, şêr şehîda rind bibînin,
Rê dibe bihost, neyar nabe dost, bîra xwe dernexînin.
Gelek qurna, pir dewrana, xwînxar em xapandine,
Kirine kole, feqir-fiqar, serê piya gerandine.
Dîroka me veşartine, ziman li me kirine yasax,
Em bi hevdu dane qirê, birînên me ne bûne sax.
Welatê me kirine çar par, li wir kirine, kêf-kêfîstan,
Kê gotiye ku ez Kurdim, jêkirine li wî ziman.
Kan-xeznê me tew birine, belengazî dane meda,
Dê-xwişkên me zêrandine, kal-pîr kirine nava derda.
Geh bûne “dost”, geh jî “bira”, heta fîta wan hatiye,
Barê wana ku rast bûye, ev gel tune, wan gotiye.
Neyarê xwe bi destî me, dane qirê, alt kirine,
Hevikekî ku xurt bûne, boy xeza me ferman dane.

Dinya îslam xeza, qutê me xelaz kir, tev me şa bûn,
Paşê hemû civiyan cikî, boy qira me tev hevra bûn.
Rica dikim, îro firsend yalê weye, wî ne xapin,
Tew bibine yek, werin cîkî, boy hebûna xwe hevra rabin.
Fitê nedin, rabe piya, îdî heqê xwe jê bistînin,
Gel azakin, serê neyar bin piyê xwe da bihecqînin.

MÎŞKO

Rewayî wan kesan dikim, yê ku nava emir da ji xwe gelekî razîne.

Mîşko hêrs bû hat îdarê,
Pozê xwe kir, wî her derê.
Gav avîtin gelek giran,
Xwe nîşan da şêr, pelewani.
Bin piyê wî dibûn korte,
Tenê zanî bû, ewî xurte.
Çermê xwe da nedibû ciye
Rûnişt cîkî bilinciye,
Şûrê lêda, çep û reste,
Jêkir, qut kir wî her tişte.
Kesî minet qet ne kişand,
Tu tişt para nehêvişand.
Dinya pêş wî bû heveke,
Dixast bike wê gaveke.
Kire şingîn, kire ringîn,
Got: Tenê ezim xweyê zemîn.
Her çar hêla pîr mêze kir,
Bîn, sêr bînê zêde dîkir.
Pêş wî tu tişt nedihat xanê,
Dixast çêke nûh dewranê.
Çi kete ber, kir tûr-tevez,

Jê dibarî xwîna gevez.
Geleka jê kirin rica,
Qebûl nekir, hîviya qenca.
Çi ku dixast, ew jî dikir,
Bê mitale, him bê fikir.
Teles nedihat qet ser xune,
Dest davîte dinya dine.
Dubar ji wî kirin hîvî,
Negirt, qedrê wî tu kesî.
Pira rêtin zar û ziman,
Bune heyran, bûne qurban.
Dîsa wî erd da ber şûra
Laf û berad dane xwe da.
Wedê dûr va wî pişo dî,
Kir çive-çiv, hejiya revî.
Pişo dû wî, sert meşiya,
Qulik-qulik wî geriya.
Çivîn gihîşt erşê-ezman,
Kesek li wî nebû xudan.
Kir zêre-zêr, hesir barand.
Pişo dest wî venekişand.
Yê bîr dike eslên xune,
Xwe dibîne yekî dine.
Dibe “Leheng” sert dimeşe,
Dawî dibe jora reşe.
Kî rûnenê şûna xune,

Wî davêjin cîkî dine.
Berxa aqîl tim dimije du makane,
Kesê aqîl, laf-berada nade xune.

GELÊ QAZAX

Zor-zor sipas, hurmet te ra,
Nan, av, hewa te da me ra.
Destê xwe kir te ser me sî,
Dilê xwe da te da me cî.
Em hevandin bi ruh û can,
Bilind girtin wek asîman.
Te da me da sebir, tawet,
Emrê şîrîn, rojên rihet.
Hêlîna germ, ruzê sala,
Xilaz kirin derd û bela.
Me ne dîtin keder û xem,
Bûne bira, heval, hemdem.
Edûyê me ra bûyî neyar,
Tev dostên me, te nan-av xwar.
Nehîşt kes me biêşîne,
Te tev me kir şayî, şîne.
Zor-zor sipas, hürmet te ra,
Bûyî bira timê me ra.

LIRÎKA

DOTMAMA KURD

Nazya meke, mînanî te bedew tune,
Esil xasî, eslê te da tu telp tune.
Horya qesra cinetêyî, kefil heqî,
Hemû pesna, tew libasa tu layiqî.

Av vexarye, te ji sîngê Sîpanê sar,
Agriya kal berjêr bûyî, nûh hatî xar.
Hîvê, royê bedewtirî, xêlif tune,
Tu loxmanî, wek te loxman tu cî tune.

Gula terî, bahar, payîz, zivistana,
Wek te bînxweş gul tunenin gulistana.
Bilbil şerma nakevine tev te leca,
Birca lê yî, kew nayêne ewan birca.

Çavê belek dil-hinava dihelînin,
Zer kezyên te hiş û sêwda cî dertînin.
Lêvên tenik tu duxavka şevêkêne,
Herdu sûretê te al sêvên cinetêne.

Cindî, bedew, mitheyr mane bedewiya te,
Rebbê jorîn neqîşandiye bejn-bala te.

Dilê bengî kî ku bibe te mêvane,
Te têr nabe, bibihurin sal, zemanê.

Qend, hingivî, nakevî ji ser zimana,
Rewşê didî tilî, pêşyên bilûrvana.
Zimanê te mehikiye tev şîrê dê,
Ev mêrxasî te ra daye reha bavê.

Naxilifî, dîl-xulama erfê xunî,
Rojên teng da piştovana gelê xunî.
Dew û doza, jan û êşa timê dûr bî,
Ewlad dora te tijî bin, bextewar bî.

Xaliq-alem dergê xêrê ber te veke,
Axa dêda hêlînekê te ra çêke.
Rihet bijî, tu jî nolî hevtangên xwe,
Neviya bibî, dibistanê welatê xwe.

**

Te hez dikim, min bawerke,
Ramûsana min keremke.
Nerm bimeşe, te mêzekim,
Kîrasekî nûh li te kim.

Bedew bêne temaşe te,
Tew nasbikin kîbûna te.
Şîrê dayika xwe helake,
Nav û dengê qenc qazancke.

Em tev xwedê bikin rica,
Welatê me bike aza.
Ser axa dê cot bimeşin,
Kuta bibin rojên reşin.

Ez vî emrên xweyî mayî,
Kuta bikim tenê tev te.
Ezet, hurmet, xudan welat,
Defîn bibim bi destî te.

SÎBE BÛ

Ro bejneke bilind bibû dikeniya,
Tîrêjên xwe werkiri bûn, ser hemûya.
Ava zelal lêvên gula dilop dikir,
Dengê dîka esman êşîn tijî dikir.
Hemû bînber xew rabibûn kar dikirin,
Her yekî bôy ewladê xwe risq dibirin.
Tew bînbera dexemiland dinya ronik,
Barê wêya tewa dikir giran, sivik.
Derketî bûm, hildim hewa sehra sivê,
Têr bibînim, tew bedewiya daye xwedê.
Ruhber, bêruh, xwedê dane xezna xune,
Nîgara wan, kişandiye destê xune.
Kevrê kêrhat, mervê bê kêr evzeltire,
Dareke rez, besteke rût qîmettire.
Bedewiya pir rebbê jorîn daye benda,
Ew firq kiriye, derxistiye fêza hemûya.
Yek zimane, wekî pê wî hewal dide,
Yê din hişe, difikire, bersîv dide.
Dayîna xwedê qîmet nekî wedê wêda,
Tuyê rehma wî bimînî tev xwelî sera.
Cî nabînî ne erd-esman, ne tu dere,
Navê teyê bê weklandin tev xwelî sera.

Tebîetê ez kirîbûm dilê xune,
 Birîbûme nav dinyake nûhe, dine.
 Wê dinyê da ne cenq hene, ne jî qale,
 Hemû bînber tene xanê zehf delale.
 Ewra nerm-nerm çapilên xwe ba dikirin,
 Bakî hênîk nazîk, bedew maç dikirin.
 Gul-kulîlka xemil didan bejna heve,
 Tew hezkirî cot-cot diçûn îdî teve.
 Kew-bilbila dikir kakîn, him jî qîrîn,
 Dengê defê bilind dibû erşê-ezmîn.
 Rastî min hat, bedeweke xal sûret da,
 Dilê min tîr da, çokê min sist bûn, mam bê sewda.
 Selam dayê, nerm fetilî, hûr kenîya,
 Çavên belek ku min dîtî, dilê min hejiya.
 Tajanên tûj min ewirîn nolî derziya,
 Min got: Ya rebb, ku xulîqîye, ev horîya.
 Wek wê bedew ne dîtî bûn min tu dera,
 Fikra birim, bal bedewên wedê Xweda.
 Keziyê zer gihîştî bûn ser penîya,
 Bejna zirav tarihana dev geliya.
 Ahîl, cahîl, gîşka li wê mêze dikir,
 Çiqas diçû, meşa cindî zêde dikir.
 Xast hinekî kêfa wêya eşq-şa bikim,
 Bibim gencek, tew kaltiesa xwe bîr bikim.
 Nêzîk wê bûm, lewzê şîrîn min hewalda,
 Min nihêrî, vebîşîrî, serê xwe bada.

Got: - Apo, berfê daniye, dûrîm here,
Destê neviyê xwe bigre û tev bigere.
Poşman, poşman min der dorên xwe nihêrî,
Seh kir îdî ewe raste, dil kewgirî.
Ket bîra min, emrê çûyî paşda nayê,
Zemîn îdî hukum daye, were rayê.

KEÇA DELAL, ÎNSAF BÎKE

Te ji hubê têr xariye,
Ezî hela pir birçime.
Bende nabin bê qenciye,
Dîl-xulamê huba te me.

Dîtina te emrê mine,
Nahebînim yeke dine.
Xeyd, naziya ji xwe dûrxe,
Jana hubê tu min derxe.

Ser kaniyê min tu dîtî,
Dinya li min sero-bin bû.
Xwest destê te avek vexum,
Edu pir bûn, firsend nebû.

Însaf, rewşa rû însîne,
Her tişt diçe, ew dimîne.
Oxura wê xêr-xezneye,
Têda çûyî poşman nîne.

Pêş însafê bersîv bide,
Hînbê, paşê hukum bide.
Her şaşîke, bê dem, bê hîm,
Dawiyê janê giran dide.

EREZ

Erez tu car nakêlime,
Terh vedide, leme-leme.
Çi dibîne, xwe dizane,
Kesek zarê wî nizane.

Geh hêrs dibe, dike xuşîn,
Dixeyîde dewrê, zemîn.
Car-carana dikelije,
Kela dilê xwe dirêje.

Der-dorên xwe dixitmîne,
Kevir, kokça cî hiltîne.
Rast û besta hemêz dike,
Bahara nûh pîroz dike.

Xwezîl, z2
arê wî, fehm kira,
Halê gelê xwe, jê pirs kira.
Jê bikira hîvî, rica,
Bihaniya cawek hêca.

DOXTOR MEHMÛD, BÎRAYÊ MÎNÎ BERAZÎ

*Delalê min, dinya ma,
Hatî tew çûn, dinya ma.
Xwezila min wî kesî,
Dû wî navekî qenc ma
Xwezil, xwezil.*

Ser axa me, îdî nebin dozên giran,
Bombên jehrê welatê me nekin wêran.
Dayîk û bav bikin şahiyên lawên xune,
Hewlêra rewş mêvan bêyî mala mine.

Tev bigerîn, tev bimeşin, şikir bikin,
Gul-kulîlkên welatê xwe em tev bîn kin.
Tewaf bikin ziyareta kek Berzane.
Sihkin axa xwe bûne îdî em xudane.

Zûtireke kuta bûna, tew rojên reş,
Min bidîta dîsa demê teyî gul-geş.
Amed, Hewlêr bibûne yek, vebûna rê,
Cejna min, te pîroz kira tamam dinê.

GEL EWLEDÊ XWEYÎ HÊCA QET BÎR NAKE

Rêwiyê bê kêr, çima ketî tu ewê rê,
Bersîv bide, çima hatî tu vê dinê?
Ewa riya çêkiriye yekî dine,
Çima wê hildişînî sero-bine.
Xwîdan pêtiye, ewî boynet nîsla têye,
Şev û roja kişandiye wî ew pêye.
Heta îro boy gelê xwe te çi kiriye?
Çi dîtiye, çi daniye, çi hîştîye.
Te li rûye kê vekiriye, gelo derîk,
Hatî dinê, dinê diçî ça qareqîtk.
Destê kîjan belengazî te girtiye,
Nan-av dayê, ciyê ketî bilind kiriye?
Riya gel da te çi zehmet kişandiye,
Dilê xwe kengê nlî mûmê helandiye.
Bêje, bêje, qet metirse, culet bike,
Te çi kiriye, yeko-yeko qise bike.
Gel ra bûyî tu barekî pir girane,
Kuda çûyî te wir kiriye tew wêrane.
Lo bêkêro, çima tu min mêze dikî,
Nolî terşa herdu guhên xwe tu cot dikî.
Însan diçe, dinya ronik tim dimîne,
Pey her kesî navê xirav, qenc dimîne.

Boy kîjan kirina, gelê, gelo te bîr bîne,
Nav nava da, wê navê te ça bikşîne.
Xizmetên baş bilind dîkin serê merya,
Ba nikare bileqîne ji cî çiya.
Seva gel te bihebîne, bîne bîre,
Gerekê te ne tirsînin qed, zîncîre.
Bibe mêrxas, karê bide gelê xune,
Peza kêrî mayî, duxe, serê xune.

XWEZİL

Xwezil, xwedê bide nisret,
Dilêm derê ewa hesret.
Ji çav kaniya su Artîzê,
Vexum ava nolî bûzê.
Herdû bî ser min daxin siye,
Têr bibînim hogrên xweye.
Vekim sivra xweye tijî,
Bixun parî nanê min jî.
Em bîr bînin rojên çûyî,
Vexun eşqa dostên mayî.
Knyaz dîsa bigalîne,
Dil-cegera bihelîne.
Cetrî, tirşo têr berav kim,
Tûrikên xwe tijî bikim.
Koçên Kurda derbaz bibin,
Ber zozana quloz bibin.
Ez jî tevî malbeta xwe,
Biçûyama ser warê xwe.
Maçkim kevrên me danîne,
Ji wan hildim, nefes, bîne.
Têr bidîta êla rengîn,
Mal-malbetê tijî, zengîn.
Bihost-bihost bigeryama,

Ro, danekî wir bimama.
Du baq gulê Arxaşanê,
Bihanyana min aranê.
Li merzelê Axa Dede,
Wî miskanê bedew, rinde.

Baqeq danya ser merzelê dayika xweye,
Hezar efû min bixasta ruhê wêye.
Bi dilekî xem-kederî, pîrî pejmûr,
Axa Fila derketama, biçyama dûr.
Pî daniya min ser axa dost Eceme,
Bidîtana dost, hogirên xweye kevne.
Biçûyama ziyaretê malxuya xweye,
Baqê duda daniya li ser tîrbê wêye.
Xatirê xwe jê bixasta biqetyama,
Ruhê min li cem wê bima, dûr ketama.
Bighîştama welatê dê, axa xune,
Li wir bida, îdî cawa mîrê xune.

1. Artîz – gundekî ser riya zozanê bû. Fêza wî da çav kanîk hebû. Hemû rêwî li wir disekinîn. Ava wê vedixarin. Sivrên xwe dadanîn.

2.Axa Dede – Li komara Êrmenistanê ew zîyarete musulmanîyêye pir qedîm tê hesavê. Wî merzelî da dayka min defn bûye.

3.Arxaşan – Çemekî zozana Êrmenistanêye. Em her sal diçûn wira.

HEY DOTMAMÊ

Hey dotmamê, wey dotmamê,
Kar-xezala nava komê.
Rind hêcane ken-heneka,
Qendin lêvên çav beleka.

Negaret

Bext wa timê nadomîne,
Geh hildide, geh datîne.
Dilê bengî ker-ker meke,
Min heyrana huba xweke.

Hey domama gulî zerê,
Sîng sedefa dêm qemerê.
Dinya ronik pêlekane,
Emir gule, gilistane.

Negaret

Bext wa timê nadomîne,
Geh hildide, geh datîne.
Maşoqê xwe meêşîne
Baqê gula dêst hilîne.

Hey domama gulî reşê,

Bejn tîtala, zar kişmişê.
Biska bade, çava kikle,
Te hez dikim, bin bawer ke.

Negaret

Bext wa timê nadomîne,
Geh hildide, geh datîne.
Paşeroja bîne bîre,
Emir nabe, bê tivdîre.

GÎDÎ, BÎLBÎLÊ AZA

Bisekine, bese bikî gale-gale,
Te hêlîna xwe çêkiriye cîkî hêle.
Nav sosina, nav rihana, him sorgula,
Dîqalînî, min pir dîkî derda, kula.

Tu azayî, çi dixazî, usa dikî,
Him difirî, him datînî, zar vedikî.
Xwedê ez tu, xuliqandî, da me ruhek,
Te ra da eşq, neda min da rihet rojek.

Wedê para, tu gihîştî para xune,
Ji xezna xwe, niqitkek jî wî da mine.
Qismetê te, bûn gulistan, bax, baxçê şîn,
Qismetê min, bûn ax, keser, dew-doz û şîn.

Qurne diçin, xilaz nabim, ez ji xema,
Ser para xwe bûme kole, nizam çima?
Were tev min, rebbê jorîn bike rica,
Param derxe, îdî destê gura, hirça.

DUH ÇÛBÛME NAV DARÏSTAN

Edlayike pîr bêhûde hukûm dikir,
Tew hebûna ser reha xwe jiyan dikir.
Bîneke xweş tijî bibû hemû ciya,
Hemû rez, gul, dikeniyên rûyê meriya.
Dihat dengê teyr-çivîka, kew-bilbila,
Kale-kala kar-xezalên nava gula.
Ketibûme, nûh dinyake wek cinetê,
Mitheyîr mabûm wê timtêşê, wê qudretê.
Çînar hêla jorê rihet sekinî bû,
Sipîndarê bejn tîtal xwe çîl kiribû.
Kal palûdê gewde, çiqil, gir kiribûn,
Bedew merxê cil û kiras guhastibûn.
Taylan çamê bilçkên xwe nexş kiribûn,
Dara diriyê nikulên xwe tûj kiribûn.
Zoxal, givîç, gez, çopılma kalî dikir,
Bê lêdida, germojê xwe qorî dikir.
Sincê enper werkiribû her çar hêla,
Sêvê xemil, xelat dabû sûret, lêva.
Her hinarek bibû weke fînca nekê,
Her hurmêyek bibû nolî gir kulmekê.
Dibiriqî dêm-sifetê alûça kal,
Werixîbû, malêz dida şivtela xal.
Albixare dikeniya, werê digot,

Qeysiya naz tem û lemên xwe difirof.
 Xurme, şîlan, rûyê erdê bibûn peymal,
 Gihîştibû, yek-yek diket gêlaza al.
 Dilerizîn, dihihizizîn, badam, fistiq,
 Bibûn cînar encîr, hêjîr, him jî findiq.
 Nergîz, sorgul hevr dibûn dost û mêvan,
 Hev aliyabûn, dihejiyan sosin, rihan.
 Qal-çîçeka sîng kuta bûn, sîngên heve,
 Xemil dabûn daristanê tewa, teve.
 Hemûşk şûna xuda rihet sekinî bûn,
 Ewan tu car tevî şuxlên hevdu nedbûn.
 Mitheyr, mitheyr min mêze kir, wê didemê,
 Hat pêş çavê kîr-kirinê mirovê gunê.
 Tevzîke tûj, sizirî ket dilê mine,
 Dengekî zelal, paqîş, hat guhê mine.
 Got: Xwezil, hemû bende herin daristane,
 Ji wir hîn bûn, çawa bijîn tew hevrane.
 Zalim, feqir neke kole, meêşîne,
 Rûyê dinê bê hildane dew, doz, şîne.
 Hemû hevra bibin dost, bibin bira.
 Biqedînin tew fermanê mezin xweda.
 Dinya bibe tew cineta xwedê şandî,
 Tew xiravî bê hildanê bijîn qencî.
 Dinya îdî rihet bîhne bikişîne,
 Her kesek li ser axa xwe malê dayne.
 Ne zulim, hebe, ne zulumkar,

Ne hukum hebe, ne hukumdar.
Ne qetil hebin, ne qetilkar,
Ne xwînîrêj hebin, ne jî xwînîxar.
Dinya bibe gul-gulîstan,
Bende bijîn şa, firevan.
Şên bin bajar, deşt û zozan,
Bende bibin li hev mêvan.

TAVÊ DANÎ

Tavê danî serê çiya,
Keçik çûne ser kaniya.
Hevra kirin ken, laqirdî
Gişke nolî heve cindî.

Hûrik, hûrik, tev dimeşin,
Çav beleke, gulî reşîn.
Dil-hinava dihelînin,
Hiş, aqila direvînin.

Poz xizême, guh guharin,
Lêv şekire, kaw-kubarin.
Fîno, qutik dêre lêne,
Qol-qol zêre ber enyêne.

Xwezil, xwezil, ez genc bûma,
Qe werexa wan biçûma.
Rebbê jorîn yek ji wane,
Bikra para nevsa mine.

BEYT

Bedewî başe, him xirave,
Jîne nabe bēnan, ave.
Te dît paşda çûne tune,
Metirse, xwe bide nave.

Bê îtbara nabe heval,
Pê nexape, bernede mal.
Merivayê pîrî dûre,
Xuliqiye bi doz, qale.

Lawo, êlê ne êşîne,
Derba êlê sivik nîne.
Wedê êl ku rabe piya,
Wê dinayayê bihejîne.

Ciyê ban nekirî neçê,
Êl te nas bike, mêrekî çê.
Neyar bila bajo ser te,
Dernekeve ji qeleçê.

Êl radibe, kêran dişkê,
Bira baş be, bîne xwişkê.
Bûrayê baş, wek biraye,
Rojê teng da pişta te ye.

Delalê min, bixebite,

Bêkar nebe, bixebite.
Şerma giran timê ewe,
Nefer birçî rûnê rex te.

Pêş neyarên xwe nereve,
Timê ji wî tu dûr here.
Wedê ku kêr dighêje hestu,
Îdî li wî, tu vegere.

Kanî nebin, cem nakişin,
Ber nabin, ewr nagurîjin.
Çiya jî pişt didin heve,
Êla aqil, diji teve.

Dehir nebin, ber çê nabin,
Ax tu nebe, bînber nabin.
Gotina beriya qet bîr nake,
Bav xirab be, law baş nabin.

Kuro, lawo, ber leqiya,
Baran barî, erd keliya.
Zarê şirîn, qet nexape,
Nebe dostê her meriya.

Nedîtiya tim dûr here,
Meleqîne, jê vegere.

Heta rûte dilê teye,
Pûrt ku lê hat, te negere.

Nav emir da rast bimeşe,
Aqil, kemal, rewşa başe.
Gavên fire kêr bavêje,
Henen rojên tarî, reşe.

Delalê min, welathez be, comerd, mêrxas,
Mêraniyê tenê dîkin esilda xas.
Şêr natirsîn, ne jî dîkin dolav, delka,
Ewladê baş bilind dîkin serê olka.

Usa swar be, peya nebî,
Sêwyê serê rîya nebî.
Wekî bigrî rîya helal,
Ji êla xwe tu dûr nabî.

Beriya gotye, qencî başe,
Te çi çêkir, ewî başe.
Helaliya bê çilk dure,
Elqulemî rîya şaşê.

Qezya ku hat, nebe lolet,
Çarê bike, tu hel-helbet.
Şepirzetî bê kariye,

Fita dayî sistayiye.

Dizî, qavî, ne tu rêye,
Nebe rêwiyê tu wê rêye.
Siya wêya amin nebe,
Weke siya bişkulekêye.

Delalê min, nesequine,
Tim kar bike, nesequine.
Keda helal kuta nabe,
Hîvya heram ne sekine.

Xayînetî, kûr mereze,
Hebûnê wê doz, qereze.
Çi dermanê li wê bikî,
Tu car nabe, ew xilaze.

Lawo, çoka bişidîne,
Bicû, paşê daqurcîne.
Ev dinyaye bê îtbare,
Wê heyfa xwe te distîne.

Lawo, gelek fıkra neke,
Her gotina bawer neke.
Paşê binî dernakevî,
Her nexastîk tirmereke.

Durûtî ne mêraniye,
Mêra şûr rast gêrêdaye.
Rastî nûra rebbê jore,
Wê qutnake, zulim, zore.

Lawo, cî ne hatî tiroş neke,
Lez nekeve, sebir bike.
Mêraniya tim bê wede,
Dawî gelek cefa dide.

Kurêm, çola qet nakeve,
Hogirên xirav tim dûr keve.
Wekî devê xwe bikarbî,
Gelê timê pişta te be.

Xayîntiye pir girane,
Weke jana dev-dirane.
Bixazî jê bibî aza,
Gerek dûr bî vira-viza.

Şêwir başe, hildî cîd a,
Nebî dilê tu kesî da.
Dayîka wêya heqîqete,
Xêr û xezne berekete.

Meclîsa da giran rûnê,
Nakeve nav şuxlê dinê.
Te pirs kirin, bersîv bide,
Neaxive herde, hûrde.

Ketî cîkî temaşeke,
Der-dorên xwe, rind mezeke.
Tew beşdara rind hîn bibe,
Hê dilê xwe, wan ra veke.

Kotan zane qayîş çi dikşîne,
Erdî keske, esman timê şîne.
Bê bawerî, bêtirs bê xwedêye,
Nebe dost, destê xew jê vekşîne.

Kîn, kudreta xwe dûr bike,
Şîretê qenc qebûl bike.
Qelbê tuyê ku şanekî,
Bixebite, pejmûr neke.

Dinya fire bû têr-tijî,
Hinek ji wê gihîşt me jî.
Hovya para me, me stendin,
Kirne kole ez û tu jî.

Bê nan, xoy ra nebe heval,

Pê nexape, wî neyne mal.
Sedaqetiyê ewî dûre,
Xuliqiye, najî bê qal.

Tew xelatê ji bîr herin,
Ev xelata minê bijî.
Gişk hatiye yek-yek herin,
Nava wan da ez û hûn jî.

Jehr bimîne nav hingiv da,
Ew tema xwe naguhere.
Çavbirçî têxî nava zêr da,
Wê tiştêkî din bigere.

Ber neyarê xwe nereve,
Tîmê ji wî tu dûr here.
Wedê kêr ku gihîşt hestu,
Holî mêra li vegere.

Delalê min, timê dûr be,
Qewmandinê xirab dûr be.
Giran rabe, giran rûnê,
Nav ulim da zanê, kûr be.

Hatiyê herin, gilî tune,
Kes nikare vegerîne.

Demeke xweş tim dimîne,
Roja îro, ya du nîne.

Lawo, senet, baznê zêre,
Her tişt dimre, ew namire.
Senetekî rind hîn bibe,
Wê dawiyê kêrî te be.

Çavnebarî kûr mereze,
Hebûna wê şer, qereze.
Çi dermanî tu li wî kî,
Tu car nave ew xilaze.

Bê îtbara nebe heval,
Pê nexape, wî neyne mal.
Ji namûsê ewî dûre,
Xulîqiye, najî bê qal.

Durûtî ne mêraniye,
Mêra şûr rast girêdaye.
Rastî nûra rebbê jore,
Wê xar nake zulûm, zore.

Lawo, bê cî, tiroş neke,
Lez nekeve, sebir bike.
Mêraniya tim bê wede,

Dawiyê gelek cefa dide.

Emrê xwedê qebûl bike,
Kîn, kudretê ji xwe derke.
Çevnebariye bê dermane,
Wê qenc nake, tu loxmane.

Çûyî çûne, pey nekeve,
Maya xweyî tu derkeve.
Qencî tu car unda nabin,
Wê pêşiya te derkeve.

Ketî zane, êşa ketî,
Kes dernayê xweyê ketî.
Zalim xweke çemrê kewê,
Wê xiravke rewşa hewê.

BEDESÎLA RA

Pêşiya xwe bişewtînî feyde tune,
Xwîna wî da xênî mekir tiştek tune.
Hebe jorê, kulma xwe qet ser hilnede,
Tengiyê derê, nolî mera wê te vede.

“Nîn bide tu nanopêja” got beriya,
Rebbê jorîn, kesî neke tu deriya.

Eyan nîne, derbaz bûne, çiqas dewran,
Însan kengê ruyê erdê bûye mêvan.
Lê mêranî, timê bûye, him jî jiye,
Hinek ji wê gihiştiye rojên meye.

FÎKRÊN MÎN

Dû bînberê xedar hene,
Yek merive, yê din gure.
Firsend kete destê wana,
Gur ji meriv pir rehmtire.

Lao, durû bawer meke,
Amin nebe, cem wî barke.
Tava şîrîn kuda ser wî,
Wê ecêbên ne bûy bike.

Zozan bê berf, baran nabin,
Xweşbaxçe bê bilbil nabin.
Keça bedew nay veşartin,
Xastiyê wê- wê tim hebin.

Esilzade ku jî rûnê,
Kîbûna xwe ji bîr nake.
Esilda bed, nebin jorê,
Wê meclîsê tevhev bike.

DELALÊ MÎN

Meclîsa da usa rûnê,
Te ranekin boy yekî dîn.
Îtbar neke murvêd dînê,
Rind nasbike tu ciyê xun.

Ber tu kesa ne xecile,
Meçe ciyê ban nekirî.
Bijî, bimeş hergav usa,
Ber te vebin hemû derî.

Rojêd xwedê zef gelekin,
Her rojekê nav lê heye.
Murovên qenc, pir hindikin,
Kuda herî, xirav heye.

Xwe ji bela xilaz bike,
Nekeve nav dewa, doza.
Hergav wana dûr mêzeke,
Xwedê bixaz risq û ruza.

Tu xwedê xwe qet bîr meke,
Riya wîda zikir bike.
Însaf, namûs cot birane,

Neyarê gir tim zimane.

Ziman şerbet, him jî jere,
Him piştovan, him jî mere.
Wekî şerbet cem te heye,
Hasil meke tu jerêye.

Giran, sivik tene cîkî,
Heye navê her merîkî.
Navê xwe tu bike bilind,
Te nas bikin, comerd û rind.

Qenc û xirav êl dibîne,
Qîmetê wan ew dişîne.
Nav-dengê baş, xas mêranî,
Nabe para her kesiye.

LAWO

Agir ra heneka meke,
Wê te cî-cî bişewtîne.
Bazirgan ra bazar meke,
Ewê te tim bixapîne.

Gotinên min têke guhar,
Darda bike guhê xwe da.

Nebe rêwiyê tu rîya xar,
Ne eşîne qelbê benda.

Riya xwedê dernekeve,
Her gotina bawer meke.
Kîn û buhza tu dûrkeve,
Kîbûna xwe tu bîr meke.

Rebbê jorîn bê rehm nabe,
Ew rehîme, him rehmane.
Berê wuyî dayînêbe,
Nanihêre tu kesane.

Malê dinê heye, tune,
Nekeve ber siya wiya.
Dû meriya nav dimîne,
Serê pira xweriye wiya.

REWAKIRIN

KEK EZİZ

*Min pirtûka teye bi ser nîvasara “Kurdistan sor” stend. Dubar-
dubar her hevok xwend. Hindik ma, wekî ruhê min bask vede,
hilkişyame qatê erşê-ezmînî herî jor. Li wir we mêze bikim, dengêkî
xêrxazî xîz va bilind biqîrim. Şa-şa bêjim:*

*Lawê Ziyoyê Bedirxan, sed eferim, esil-kokê te ra. Haşa ku tu
lawekî gelê Kurdî pir comerdî û mêrxasî. Te bi saya aqil û kemala
xwe, bi culetekî mêranî va ser wan qirar û fermanên rêspûblîka
Adirbaycana Sovêtiyê ku derbeqa parçe erdê Kurda da, “Kurdistana
sor” da dabû. Lê ne qedandibûn vekir. Ew rezîliya ne baxişandî,
nîşanî temam dinê dan. Zor, zor sipas we ra.
Beriya timê rast gotiye: “Berxê çêyî ber kozê da çêye”. Danîyê ew
dibe beran.*

Rastî çiqas bihecîqe, zirav bibe, lê qut nabe,
Xayîn çiqas biçerçire, feyde tune, tê mal nabe.
Şêr dikevin tim jî şêra, ev eyane, birê delal,
Kaniyê têrav çiqasî jî şêlû bikin, dibin zelal.
Tîr wedê ku jî cî dertê, îdî tu car paşda nayê,
Ewlad kengê xirav dertê, rexne dikin şîrê dayê.
Baş derketî, yeqîn herdu rehê te jî nişa xasin.
Mêr dikevîne ku meydana, fedî nakin, qet natirsin.
Beriya timê rast gotiye: “Devê mestir, fîl jî heye,

Cermê devê tim datînin, tenê li ser pişta çêye”.

Geleka xwe pir pesinîn, hatin û çûn, him dimînin,
Tîmtêşa te kesek tune, ew tu cara Ezîz nînin.

Boy mêraniyê xwedê du xelat dane bendê xune,
Ewil aqil, ya din culet, cem pira ew xelat tune.

Malê dinê suryê tûje, kaş-kerîşa dihedmîne,
Nav û denga, mêraniyê qazanc dike, tev xwe tîne.

Mêraniya te, te geleka bilind dike qat-qat jore,
Cî hatinê dibî eslan, nadî kesî mecal, dore.

Te navê xwe dîrokê da da nîvîsar bi herfê zêr,
Mêrhatiyî tu vê dinê, sed eferim, dimîni mêr.

Ez ji te ra dil dixazim, saxlemiya bê hede pir,
Rebbê jorîn bide ser te, siya xweye şeveqe gur.

BÎBE ZANE, BÎJÎ AZA

Rewayî yek saliya rojbûna Bîlalê Îsa dikim.

Bilal mêrê-mêrane,
Şêrê serê çiyane.
Him boke, him berane,
Şîrînê tew qewmane.

Stêrka geşe esmane,
Kulîlkê nav mêrgane.
Kurik lap pelewane,
Pîrik bibe heyrane.

Mezin bibe, per vede,
Şerefa xwe bernade.
Bibe zane, him maqûl,
Bijî aza, nebe qûl.

Dê-bavê xwe hez bike,
Şuxlên başe, qenc bike.
Pir aqil be, pir kemal,
Piştî dersa wera mal.

TOYE ÎŞEV

Remayî şahiya Nadirê Ezîzê Ziyoyê Bedirxan dikim.

Toye, toye, toye îşev,
Bixun, vexun, şabin îşev.
Bûk û zavê bînin cem hev,
Pîroz bikin, kêfkin îşev.

Bextewar bî, bextewar bî, bûkê can,
Aqil, kemal, lel û dur bî, bûkê can.
Nazik, bedew, dêda nebin ser te ra,
Bibî dayika tu keçekê, hevt kura.

Gula ter bî, reh-belgên te ne çilmisin,
Tîm eşq-şa bî, reş çavên te nebinisin.
Tevî Nêdir cot bijiyî, dûr bî qezya,
Ser axa dê bikî şaya kur-neviya.

Nava gel da te nîşandin bi tiliya,
Bigrî qedrê erf-edetê tew beriya.
Hemû pêş te temenne bin, ber te rabin,
Hurmata te bilind bigrin, te ra şabin.

Esil-koka xwe bîr nakî, qet tu cara,
Boy kîrnên xwe ser bilind bî, tu her cara.
Sosin, rihan, gula bîn bî, bûkê can,
Pê-parê te pîroz bibe, bûkê can.

EWLADÊ ÇÊ LEL Û DURE

Rafîkê kur bira, rojbûna te pîroz be.

Çi diçînî, wî diçînî, tiştê cuda jê dernayê,
Esil-koke ku ne xas be, ewlad tu car baş dernayê.
Dinya behre, murov nav da giran-sivik wek zileke,
Qenc û xirav, dû xwe timê ew dihêle yek naveke.
Sorgula ter nav pîja da dixulîq, per vedike,
Misk û enper reha wê tê, wê ji pîja cuda dike.
Ewladê çê lel û dure, xezna tijî, xemil, rewşe,
Boy dê-bava bextewarî, emrê dirêj, roja geşe.
Cem xwedê xwe serbilinde, pîr qedirî, pîr qîmete,
Nav êlê da nav û dengî, serfînyazî, bi hurmete.
Bila xwedê timê ser te sî-sitara xwe kêr neke,
Te bê qezya, bin-baskên xwe da tim xweyî bike.
Ewa kesê, xwastina gel bilind dibe, ew nakeve,
Gel ku ne xwast, nav emir da, ew tu cara bilind nabe.
Rojbûna te dilekî eşq dubar-dubar pîroz dikim,
Sed û yek sal ez ji boy te, rebbê jorîn rica dikim.
23.12.2008.

APÊ CASÎM

*Rewayî sed saliya ji dayikê bûyîna helbestvanê Kurdî eyan Casimê
Celîl dikim.*

Xwezil, xwezil, biçûyayî dilovaniyê ser axa dê,
Her çar parê welatê me, bibûna yek evê dinê.
Merzelê te me daniya cîkî rewşî, pir bilindcî,
Te ji wira mêze kira, Kurdîstana xweye cindî.
Bidîtana deşt û zozan, cem û kaniyên welatê xwe,
Ruhê te têr bigeriya, li ser axa kal-bavên xwe.
Gel bihata ziyareta te, baq-baq gule destê wan da,
Mirazê te hasil bûya, rihet razay mala heq da.
Ez jî tevî helbestvana bihatama ziyareta te,
Çend helbestên teye zelûl, bixandana pêş tîrba te.
Boy min îdî dereng be jî, min tem kira, tema welat,
Tew pirtûkên teye hêca, hatiya ra bidan xelat.
Keç û xorta dor tîrba te, bireşanda kulîlkên al,
Welatê me derketana îdî hemû dew, doz û qal.
Hezar, hezar rehme te be, helbestvanê Kurdî kemal,
Ez bîr nakim, ji dêmê we, tim dibarî nûra zelal.
30.05. 2009

NARÎN, EVÎN, YEK SALÎYA WE PÎROZ BE

Bedew, bedew, navê we,
Rafîka şêr bave we.
Sêvîl xanim, dayîka we,
Maçkin herdû çavên we.

Dûrbin, dûrbin, hûn dûrbin,
Qeda, bela tim dûrbin.
Bin ezmanê çîk-sayî,
Qismetê we eşq, şayî.

Bibin gulên al-gevez,
Bijin nava baxçê rez.
Tevî gelek xwîşk-bira,
Karê bikin hûn xwe ra.

Namûs-xîret tacê we,
Aqil-kemal para we.
Bibin sitiyên naze-per
Dûrbin ji we xem-keder.

Hîv şabibe we mêzeke,
Roj tîrêja ser we werke.
Hûn bîr mekin eslên xune,
Tim şa bikin dê-bavê xune.

“DOSTÊ MÎN”

Dest vekşîne, hevsûdiyên kîn-qirêje,
Wan hemûya ji dilê xwe tu bavêje.
Bibe meriv, rihet bijî, meçerçire,
Bese bikî, wan îtrafên pûçe, bire.

Hatî dinê, gava bavêj tevî zemîn,
Xwedê çi da, wî qebûlke, bêje amîn.
Şikir bike, çav nekute tiştê dine,
Biteyîse, hindik lafa bide xune.

Bifetile, piçek dû xwe rind mêzeke,
Te çi daye, tenê derheq wî qiseke.
Tenê bûyî barê dinê, hatî, diçî,
Tu wek zilekî tim bê kêrî hişkî, pûçî.

Ewa kesê kar kiriye boy gelê xwe,
Pêş wî sed car bitewîne tu bejna xwe.
Bin piyê wî venakole, jê dûr here,
Garanê da tu hevalê xwe bigere.

LO BÊ ÎTBAR

Dostê “delal”, însaf bike, tu wa neke,
Tunca “bedew”, çep û rast tu şeneke.
Rind nas dîkin berê-berîda herdu heve,
Pariyê dawiyê me xwariye tême teve.
Kî bed eslî, dilê te da xwe ra kir cî,
Boy min dostî, wir da nehişt hevikek cî.
Ew jî ku hat, heta nika ewî ku bû,
Ku raza bû, bin çî kulê ewa rabû.
Çavê teyî timê min bû, meke jî bîr,
Min tu qat-qat bilind kirî, nebî sexîr.
Nika çî bû, tu bûy axa, ez bûm xulam,
Kê emr da tu bibî torin, ez jî xulam.
Were em îdî enenekin, bê kî, kiye,
Boy gelê xwe çî kiriye, çî aniye?
Mal qirêje, nespêre wî pişta xune,
Maqûl ewe, rind nas bike eslê xune.
Kesê aqil xwe ra negre şûn û ware,
Dîqulibe, ser qotê xwe têye xare.

DENGÊN WE ME RA, KEREMA WE XWEDÊ RA

*Sazbend û dengbêjê “Koma Kurdistan”ê Îsa, Reşîd, Şîrîn û Mistefa
ra.*

Rebbê jor hûn xelat dane boy êla me,
We ked rêtiye, bilind kiriye hurmeta xwe.
Çûka ra çûk, mezina ra bûne gorî,
Pêş we timê vekirîne hêmû derî.
Dengê we diçe esmanê çikî-sayî,
Digihîje Kurdistanê, hemû çiyayî.
“Nan bide nanopêja, yekî bide zêde”
Ne nanopêj ve, parîkekî jê ra nede.
Pariyê hundur pariyê der tim temtire,
Qedrê nasa, qedrê nenas qîmettire.
Heta dawiyê tu şayê me bê we nabin,
Ser axa dê, hûne timê tevî mebin.
Wira aza biqîrînin, qet netirsîn,
Ber defa we, em pîre kal bireqîsin.

DOTMAM

Çûyî ez mam, nîzam çîma,
Ketim nava keder-xema.
Bê te rojêb bûne yek sal,
Te ez kirime, bengî, qewal.

Dernakevî bîra mine,
Naçî jî pêş çavên mine.
Kuda diçim, te dibînîm,
Bê te sewdeserî, dînim.

Dil dixaze, tu tunenî,
Ter kulîla timê bînî.
Lihêf ser min bûye sirîn,
Boy te zarêb bûye birîn.

Xewna şeva te dibînîm,
Diçî, te ra nagihînîm.
Têyî xanê, xayî dibî,
Ruh-hebûnam, xwe ra dibî.

Dûr va dengê ku tê mine,
Hew dizanim dengê teye.
Bejnê te tên çavên mine,

Şa dibim, ew bejna teye.

Dilêm giritye toz, xubare,
Binê wan da tim tu heyî.
Te bîr nakim, qet tu care,
Jiyana min tenê tuyî.

Gul vebûne hemû qulça,
Rewşek hatiye, baxa, baxça.
Te nabînim mala xwe da,
Dikewirim, halê xwe da.

Te pirs dikim, hîvê, stêrka,
Qelfê keça, komê xorta.
Dergevana, rêwiyê riya,
Koçervanê serê çiya.

Teyrik-tûyê ser hêlîna,
Terewilê dora lana.
Şivan, gavan, him berxvana,
Kal û pîrên ber bostana.

Sosin, nergîz, tew sorgula,
Zer-zinara, zaxên vala.
Xulam, olam, dergevana,
Qusêsiya bêrîvana.

Hemû dengbêj, tew saz benda,
Bûk û zavên nav govenda.
Gira, hûra, gelek benda,
Tew kolanên bajar, gunda.

Min dîtiye, kes nabêje,
Çav şil dibin, dil diheje.
Dost-hogira dikim rica,
Te pirsbikin hemû qenca.

Ewqas nebe, tu bêitbar,
Bese hêrsêm tu bînî xar.
Carek bibe mêvana min,
Vî ezabî derxe tu min.

**

Tew bedewa mêze dikim yeko-yeke,
Wek te cindî qet nebûne tu keseke.
Bext carana dixalife, şaş dimeşe,
Emrê şîrîn rojên eşq-şa dike reşe.

Xwezil, carkê, bihata min rind dengê te,
Cî rabûma, têr bidîta min bejna te.
Rûbirû me bikirana gilî-gazin,
Em ji hevdu dûr nekira rebbê mezin.

Felek ne hişt, emrê şîrîn em tev qut kin,
Nêt-meremên xweye mayî tev xilas kin.
Qesem dikim, bê te çiqas ez bimînîm,
Rind navêje ser zimanê xwe nexînîm.

**

Berbir dibim, rebbê jore,
Jê dixazim molet, dore.
Carekê jî me bê rehmê,
Hev bibînî, em vê dinê.
Cîkî herin welatê xwe,
Vexun avên çar kanyên xwe.
Têr bigerin deşt, zozana,
Seyrangeha, gulistana.
Gav, rojekê bijîn teve,
Dilê xwe vekin em pêş heve.
Heta kengê min dûr herî,
Dinya heq da tek bigerî.
Were hevdu em bibînî,
Gulên welêt biçîrpînî.

BAYRAMELÎ YEK SALÎYE

*Hetemşa, pismamê minê delal, şikir îdî tu jî bîyî kaloyê kur.
Rewayê yek saliya Bayrameliyê piçûk dikim.*

Kalko, kalko, kalko can,
Xwedê da te yek beran.
Bextewar be ew her dem,
Ji wî dûrbîn, qeda, xem.

Siya weye tim ser be,
Pîrik timê li cem be.
Dê û bav wî hez bikin,
Mehez bikin, maç bikin.

Dû wî rêz bin xwîşk-bira,
Tew bedew bin wek çira.
Malê hevxin sero-bin,
Her yek pesna bide xun.

Kalko, kaşke guhên wan,
Pîrik bike gazinên wan.
Pirs û xofê mekşînin,
Tim hûr bikin, hilşînin.

Hemû bibin zanê kûr,
Ji axa dê nebin dûr.
Bihebînin gelên xwe,
Bigrin destê kalên xwe.

QADÎRÊ MINÎ PÎÇÛK

Gotinên min qet bîr meke,
Şîretê min hilde xwe ra.
Destê xwe da têke mertal,
Bijî, buxe keda helal.

Tim bigere ser bilinde,
Here pey şuxulên rinde.
Çav nekute keda kesî,
Rihet bixwe nanê tisî.

Bêkêr neger ber deriya,
Nebe dilê tu meriya.
Dêda bûyî ça çilke zêr,
Mêr hatiyî, bimine mêr.

Mêraniyê nayê ziyan,
Bibuhurin çiqas zeman.
Boy kirinên xwe mitaleke,
Berê bipîv, paşê jêke.

Tên gotinê tim şuxlên baş,
Rûreşîye tew kîrnên faş.
“Gîha dertê ser koka xwe”,
Unda meke tu eslê xwe.

Laf, derewa gelek dûr be,
Nav ulimda zane kûr be.
Xebathez be, biçerçire,
Riya heqiyê tu bigire.

Heqî çiqas zirav bibe,
Ew namire, ew qut nabe,
Bîna gula jê dibare,
Tu car serya nake xare.

Hurmeta xwe tim bilindke,
Roja vala derbaz neke.
Heyran bêje, can bibihe,
Xirav neke rewşa hewê.

Lao, dizî senet nîne,
Menzîla wê dirêj nîne.
Kî dikeve ewê rêye,
Dawiya wî pûç, finêye.

Keda helal, xilaz nabe,
Heramva çêv tijî nabe.
Serî qûce, binî pûçe,
Dawî tune, hîmda hêçe.

Bibe xweyê giliyê xune,
Amin nebe, yekî dine.
Ocaxa xwe mehêl vala,
Boy zikê xwe mekev çola.

“Çavê derya, xwelî serya”,
Çav nekute tu deriya.
Senetekî rind hînbibe,
Bi wî timê bilind bibe.

Paqîşayî rewşê tîne,
Sipî dike rûyê însîne.
Derga pêş wê tim vedikin,
Hurmeta qenc wêra dikin.

Hemû ber wê duqat dibin,
Navê wê tê cî radibin.
Ezet, hurmet dibe bêhed,
Pêş wê tune sînor û sed.

Wey wî kesî ku hurmet ket,
Navê wiya xirav derket.
Hemû ser wî dikin qelfa,
Jê distînin heqa, heyfa.

Dibe pê ken, tewzî, tejî,

Nolî seka, gura dijî.
Kuda diçe pê dikenin,
Pêş riya wî disekinin.

Wî nahêlin tu der, ciya,
Dibe mişkek, ewa “zîya”.
Sitar nake li tu dera,
Dibe xurê mişka, mera.

Bin piya da dêriz dibe,
Diheçiqe, pêpez dibe.
Çawa meriv wî nas nakin,
Derge, derya ber venakin.

Dişewite halê xwe da,
Dikewgire pêda-pêda.
Firsenda xwe daye dere,
Çi jî bike, ew hedere.

Lao, aqil tacê zêre,
Serê xweke, pê bigere.
Kesê ji wî dibe dûre,
Wek zilekî pûçî, hûre.

MEDÎNA MÎN

Rojbûna te pîroz dikim, rindika min,
Mezin bibe, şake dilê tu kalê xun.
Riya emir pêş te, bê kaş-kerîş bibe,
Nûra xwedê hergav, herdem li ser te be.

Bayê zemîn geş dêmê te neqimlîne,
Bedewiya te bila timê wa bimîne.
Çend xwişk-bira dû te werên, nebî tenê,
Bi dê û bav, bextewar bi, tu vê dinê.

Dibistana hatina te ez bibînim,
Destê te bigrim, axa dê bigerînim.
Kewaca welêt dilêm derê ewê demê,
Xilaz bibim, ji ezabê dûrketinê.

CAR-CARANA, WA JÎ DÎBE

Rewayî kesên bêîtbar dikim.

Ew dinyaye, bê îtbare, wa jî dibe,
Bendê xwedê geh dikeve, geh radibe.
Du halane, ber weldêye, dayîka şevê,
Kes nizane çiyê bibe, heta sibê.
Barê dinê geh rast dibe, geh jî xare,
Heta dawiyê hindik dijîn bexteware.
Gav, roj dibin agir, alav, him zikurmet,
Geh jî dibin xêr û xezne, şîrîn, şerbet.
Dinya timê sîtileke kelandiye,
Hineka dipêje, hineka radike pêye.
Qet naxazim ji armancê bibim dûre,
Tew dîtînên xwe rêz-rêz bikim hûre-hûre.
Unda bûya hevdu dîtîn, kenyan, şabûn,
Hezar carî şikir gotîn, serhev kalbûn.
Bav jimirîn, ne gihîştin hinek heve,
Nizanibûn, kîjan qurna jîne teve.
Dîroka xwe anîn holê, tişt nedîtîn,
Kî, ku hatibû, hev nepirsîn, pey neketin.
Li eslê xwe nebûn xweyî, ew avîtin,
Zû bavekî terî-teze xwe ra dîtîn.
Bûn ap, kurap, av nekişya nava wan ra,
Şerm nekirin, pir laf, berad dane xwe ra.

Esilzade nizim kirin, xwe bûn evraz,
 Gotin emin vê dinê da tek teyrê baz.
 Ketin nava kol û kosa, vala hatin,
 “Teze ku tîn, kevn xelatin”, hevra gotin.
 Bilind firîn, çep, rast lêdan bûn şereze,
 Tewyan, mêl bûn, gişk pêş bavê xweyî teze.
 Meclisa da dor nedane, qet tu kesa,
 Bûn esil xas, tinaz kirin hemû kesa.
 Ji zimanê wana barî mencêneqî,
 Xênî xirav bîr ne anîn qencî, heqî.
 Cermê xwe da cî-war nebûn, bûne beran,
 Dest avîtime hemû qulça, hemû deran.
 Xastin hemû hevdû qut kin, rut be dinê,
 Tew zîqa bin, ew bimînin tek û tenê.
 Bin piyên xwe neniherîn, gav avîtin,
 Kesî tu şûn neda wana, ewtiyan, ketin.
 Yekbûna wan, bû dîwarê li ser kefê,
 Beriya gotye “Dûr va xweş tê gengê defê”.
 Dawiyê bûna tejî, cewir, hêdî meşîyan,
 Warê bavo tolan girtin, tirs kûziyan.
 Rebbê jorîn nabaxşîne kesê hare,
 Per-baskên xwe ser wî nake sî-sitare.
 Hesin tu car bê germayî hevdu nagre,
 Beqî pira, pê ser cema hevdu digre.
 Boy yekbûne esil, bingeh, ferz, eseye,
 Biratiya bê hîm berfa ber tavêye.

Zû dihele, dewsê tu tişt nayê xanê,
Dibe barek, rûdinê ser pişta dinê.

HELBESTÊN ZAROKA

Navê kurkê Ezîze,
Bejn bilindî, deng zîze.
Tew dersê xwe dixwîne,
Ji hevala namîne.

Berî gişka ew tê mal,
Pir aqile, pir kemal.
Xurekê xwe zû dixwe,
Têlêvîzorê vênaxe.

Pîr, dayîka xwe hez dike,
Tîm xebera wê dike.
Naêşîne kalê xwe,
Dike hemû şuxlên xwe.

Zû radizê, radibe,
Tev her tiştî ew nabe.
Ji mektebê namîne,
Tew dursa pênc distîne.

**

Yek û dudu, sisê, çar.
Çûme warê meyî par.
Dît keweke gewre jar,
Dest avîtê, kir pirîn,

Çûçika dû kir qîrîn.

Pênc, şeş, hevt, heyşt, neh û deh,

Çûme bin dareke reh.

Dît bilbila gerden zer,

Destê xwe min danî ser,

Firî destê m derket der.

Yanzde, danzde, sêzde, çarde,

Ketim koşka bilind, rinde.

Dît kurekî cindiyî gir,

Em hevdu ra bûne hogir,

Kewkam hilda wî xwe ra bir.

Panzde, şanzde, hevde, heyjde,

Çûm kaniya sere, rinde.

Xwest dilopek av jê vexum,

Mezin bibim, heyfa derxim.

Dilop şabû, got: Xêr hatî,

Tu min vexwe, nemîne tî.

Nozde, bîst, bîst yek, bîst û du,

Dît xezala pîr suru.

Xwest bigrim, tîmarkim,

Pê şabîbim, jê hezkim.

Wê ez dîtîm, revî çû,

Karik mikyan dane dû.

Bîst sisê, bîst çar, bîst û pênc,
Dît şêrekî girî sênc.
Sekinî bû nolî çiya,
Min xwest herime ez cem wiya.
Xwe firfitand kire nirîn,
Tew terewil ji wî revîn.

Bîst şeş, bîst hevt, bîst û heyşt,
Min xwest bikim, seyran û geşt.
Dît zaxake vala û sar,
Zer zinarên gire û xar.
Çivîkekê kir wîtin,
Dest avîte kir pirîn.

Sî yek, sî dudu, sî sisê,
Berjêr bûme nava Qersê.
Dît kulîlkên kesk, sor, sipî,
Lê sekinîm, min neavît pî.
Xwest livekê hildime dest,
Destê mî lêket, xar bû şkest.

Sî çar, sî pênc, sî û şeş,
Gihîştîme bera rêş.
Dît mesîkî şim-şimok,

Çûçkanokî rev-revok.
Xwest bigrim wî rihet,
Şimitî destêmin derket.

Sî hevt, sî heyşt, sî neh, çil,
Çûme nava baxçê gul.
Kalê min girt destê min,
Gulek hilda zû da min.
Got: - Vê gulê hilîne,
Bê min hilneqetîne.

Çil yek, çil dudu, çil û çar,
Karka bavo gura kar.
Bavêmin dû ket, bikuje,
Xwîna wiya birêje.
Dest avîte tivingê,
Ew venebû, wê hingê.

Çil pênc, çil şeş, çil û hevt,
Kalê min darê da ket.
Pîra min kir îskîne,
Dayikam min kir qîrîne.
Kalêmin rabû ser piya,
Wan nihêrî kenîya.

Çil heyşt, çil neh, pênc û yek,

Birêm nan xar, pê bû dek.
Dayîkam ser wî pîr hêrs bû,
Kevîr hilda kete dû.
Birêm revî ket gume,
Hewar da wî tew zomê.

BÎLBÎLA MÎN ZÊRÎNE

Tavê, tavê, tavokê,
Bide ser min tîrekê.
Mezin bibêm, bibim şêr,
Bibim boke, bibim mêr.

Hîvê, hîvê, şemalde,
Tariyê ser min hilde.
Te ra bibim hogir ez,
Bijîm nava baxçê rez.

Cem, cemo, nekişe,
Bese bikî guş-guşe.
Karka mine zef tiye,
Bê te nabe, cindiye.

Bilbila min zêrîne,
Tu şaişa nakşîne.
Dora gula digere,
Digalîne, difire.

Kewka mine cindiye,
Him sore, him sipiye.
Şev-roj dike qibîne,

Çûçika dihevîne.

PIŞO

Pişo, pişo, pişo can,
Were kurkên min mêvan.
Pûrtika me şe bike,
Mehez bike, hez bike.

Te tevî xwe razîne,
Nav, ava te bihgîne.
Jê nerevî gelek dûr,
Îdî mekî xûre xûr.

Mişka qotke yeko-yek,
Negere bê sîlah-çek.
Neyarên xwe alt bike,
Koka wana red bike.

PEXŞAN

(nivîsara wekirî)

DAYİKA WERDEK Û KEVİRÊ REŞ

Gundê meyî ewqasî jî ne mezin bû. Nûnerê sê gela - Kurd, Azerî û Ermenî (file) tê da dijiyan. Çawa dê û bavên me, usa jî me hemû zarên gund, hevdura hevaltî û çîartîke gelekî şîrîn dikirin. Em hemû roja tevî hevdu bir, çavgirtî, gasêtek, fûtbol, nehberek, sê rêzk, tame û gelek lîstikên gelirîye cure-cure dilîstin.

Me bi hevdura sê zimana (Kurdî, Azerî û Ermenî) paqîş û ferih hewal dida.

Gelek cara ku dibû şev, em malên hevdu da diman. Cîkî şîva êvarê dikir. Tevî hevdu radizan. Me dayikên hevdura “Dayê, ana û mayrîk”, bavê hevdura “Apo, emî, û horyêxpar” digot.

Dibistana gundê meye hevtsele bû. Du parên wê hebûn: Fileyî û Azerî. Me zarên Kurda herdu para da jî dixwend. Piştî dursa me berx û golikên xwe dibirine bintara gund. Wir tehtekî mezinî, berî şimotek hebû. Me gelek cara ser wî tehtî xwe dişimitand. Diketin, dev, diran û pozê me xwîn dibû. Hinekî digirîyan. Lê dîsa jî, ji wê mijûliyê dest venedikişand. Em ewqasî wan lîstikên xweye cure-cure va mijûl dibûn, wedekî xwe dihesîyan, tariyê îdî erd hilcîniye.

Cimaeta gundê me jîyanekî gelekî başî, ewq û şa derbaz dikir. Hemûye hevdu ra heyîrî bûn. Wedê gund da şîn û şayî diqewimîn, gişka mînanî bira alîkarî didane hevdu da.

Mêvanên ku cîyê dûr seva şînê dihatine hewariyê, êvarê cînara ewana hevdu parvedikirin. Dibirine malê xwe. Sê roja nedihîştin mala şînê da koçik bê danînê, xurek bêne çêkirinê. Her maleke cînar xurek çêdikir û dihanîne mala şînê.

Wedê şaya da jî cînara dîsa mêvanê hatî hevdu parevedikirin. Bi gilîkî kurt va, merivên gund gişka hevdu ra cînarî û biratîke helaliye bê çilk dikirin. Nolanî merivekî xêra da xêr, şerê da şer, tev dimeşîyan, alîkarî didane hevdu.

Telebextra, nika ji wan dayik û bava gelek hindik mane. Hineka dinya xwe guhastine, hineka jî çiyê xwe.

Ez dixazim, derheqa dayikeke wî wedeyiye pir nav û denge, qedir, qîmete, kîjan ku wê îdî dinya xwe zûda guhastiye qiseke kurte şîrîn vekim.

Van paşwextiya murovên gundê me hemûya wê ra dayika Werdek digotin. Tu kesî xêr û şerên xwe bê wê derbas nedikirin. Ew timê jorê didane rûniştandinê. Gelek cara bi şêwrên wê şuxulên xwe diqedandin.

Dayika Werdek kî bû, ji ku hatibû? Bi qisekirina diya min (Werdek û dayika mine emrekî da bûne) wana keçîktî û cahiltiya xwe cîkî derbas kiribûn. Werdek çend salên emrê xweyî zaroktiyê li pareke Kurdistana ku bi destî zorê ketiye bin bandora Roma reş derbaz kiribû. Malbeta wan jî nolanî gelek malên Kurdaye mayîn bi emrê dewletê yalê ekserê Hemîdiya da hatibûne wêran kirinê.

Şevêkê taxime leşkerê dewletêyî nizamiyê ser gunda wan da digre. Dest bi qira cimaeta gunde bê guneye, ame-tam dike.

Gundê wanî nêzîkî Agriya Mezin bûye. Wê şevê hindik merivên gund ji ber xezayê dikarin xwe xilaz bikin. Ji wan xilaz bûya, yek jî Werdeka piçûk bûye.

Piştî gelek rojên girane û dijwar ew û du keçikên gunde piçûk, rex cemê Eres rastî komek hêsîrên Kurda tên. Heman şevê ew û herdû keçik tevî wan xwe Erez dixêrin wekî bêne Ermenîstana Sovêtiyê.

Gelek ji wana avê da dixeniqin. Hinek bê sero-bin ro da diçin. Werdek heta kutasiya emrê xwe rastî wan keçîka nayê. Sibê sînorvan gazî Kurdên nêzîkî Erez diman, dikin. Wan hêsîra ser malê wan parevedikin. Werdekê didine mala Hesên, kîjan ku ew gunda û dewletê da camêrekî pir qedir û qîmet dihate hesavê.

Hesên Werdekê çawa ewlada xwe qebûl dike. Wê ra bawtîke gelekî baş dike. Werdek çend sala mala Hesênê welatparêz da dimîne. Sal derbaz dibin. Ew mezin dibe, digihîje asta keçikîyê herî cawdar. Dibe bedewekî usa, wekî cimaeta gund wê bi tiliya nîşanî hevdu dikin. Gelek cahilên gund ser wê dibine bengî, dû wê keserên kûr dikşînin. Car-carana jî hevdura dikevîne hucetê û şerê sivik dikin.

Di gundê me da Ecoyek hebû. Eco kî bû? Ew çawa hatibû gundê me? Eco jî nolanî gelek zarên Kurde hêsîre bê sitar ber xeza leşkerê Roma reş xwe xilaz kiribûn. Erez xistibû. Hatibû ser axa Ermenîstanê. Bext û talqê wî û Werdekêye nolanî hevdû bûn.

Ewî bedena xwe va ewqasî jî ne saxlem bû. Wî zaroktiyên

xwe bin zulm û zelûliya begên hoviye xwînaxar da derbaz kiribû. Ewî hevt saliya xwe da berxvaniya wan kiribû. Bavê wî jî tamamiya emrê xwe da tenê şivantî kiribû. Loma jî ewî dîsa ezabên wan rojên giranên ne bîrkirî dikişandin. Gundê wanî jî nêzîkî Agriya Biçûk bûye.

Sibekê wedê ku Eco berpala fêza gund berxa diçêrîne, dibîne ku merivên gund beravî meydana nava gund bûne. Nava wan da çê-çar siyarên nenas têne xanê. Dengêkî nenas tê.

Ew berxa dihêla û nêzîkî cimaetê dibe. Zabitekî û çend eskerên tirk dibîne. Zabit destê xwe ser muxtarê gund da dihejîne û gelekî bi hêrs dike qîrînî: “Köpek, çabuk ol, yoksa kemiklerini kırarım...” dibêje. Muxtar pêş wî diricife, tîrsa serê xwe bilind nake. Zû-zû dibêje: “Ağam, efendim, bekle, şimdî her şeyi yaparım”.

Eyan dibe, wekî zabit ji muxtarê gund xêlek mêr û gelek terşên bar-bir dixaze, wekî pê wan terşa boynet eskerê dewletê ra zexîre û gelek çekên cure-cure bigihîne wan eskerê dewletê. Kîderê ku mêrxasên Kurd ji bo welatê xwe miqabilî dewleta Roma reş şerê azadariyê dimeşînin.

Muxtarê gelfiroş, xastina zabit diqedine. Xêlek mêr û terşên bar-bir teslîmî zabit dike. Dîsa pêş wî dibe duqat, zû-zû dibêje: “Buyur ağam, efendim”. Zabit fıkra xwe qet nade wî. Ew û eskerên pê ra hatî cimaeta beravbûyî didine ber qamçiya, çêra dîkin. Wan meriva û terşa didine ber zengûyên hespa, ji gund dertên.

Muxtar xêleke xurt ji tîrsa serê xwe qet bilind nake. Nolanî qareqîtkêkî ciyê xwe da disekine, paşê gelekî hêrs ser cimaetê da diqîje. Wana ra çêra dike. Emir dike, wekî her kesek here xerava xwe. Telebextra muxtar Ecoyê belengaz jî tevî wan mêrên çûyî dike. Eco nikare emrê wî neqedîne. Lê mitale dike, wekî bi çi rê va heyfa xwe ji wî milletfiroşê durû bistîne. Şev xwe hêdî-hêdî nêzîkî gayekî çekbir dike. Nişkêva wî didefîne. Ga zerê da tot dibe. Wedê esker çawa totbûna gayê çekbir didine zabit, ew nolanî gure merivxwar dike qîrîn, emir dike ji gaajoya yekî bînine bal wî.

Esker Ecoyê belangaz tînine cem zabit. Ew derheqa totbûna gê ji wî dipirse. Eco serê xwe bilind nake, qet wî nanihêre. Zabit dixaze wî cî bi cî guleke. Paşê fikira xwe diguheze. Emir dike, wekî wî bibin û heta mirinê zope lêxin. Ciyê ga tê da tot bûye, wî jî wê zerê da bavêjin. Esker Eco tezî dikin. Ser zik vedlezînin û dest bi qedandina gotina zabit dikin. Carana jî bi dengêkî gelek kîn diqîrîn: “Al, gavur, sana bu da azdır. Şimdî seni köpek gibi geberteceğiz” dibêjin.

Wedê Eco çavê xwe vedike, xwe şikevteke sare, tarî da, nav gelek merivên belengaze nenas da dibîne.

Kalekî nûraniyî rûdan sipî cem wî rûniştiye. Serê wî daniye ser çoka xwe, hêdî-hêdî porê wî mehez dike, zarekî pir şîrînî kewgirî dibeje:

“Kurê, tu şayîşa mekişîne, apê te nahêle tu bi derba wan neyarên xwînreje qirêj bê wede ji dinê herî. Lawo, xwedê heye, xem tu nîne. Qet bîr neke, Xwedê ayîkê beranê kul,

beranê kel ra nehiştiye. Nika ewe kelin, eme hela ku kulin. Naha wedê wana jî wê bê. Ewî jî boy kirinên xweye hovî bi hezkirina rebbê jorîn wê ber Kurda bersîvê bidin. Lawo, dûmeka dinêye dirêje. Pey her şeveke reş timê sibeke şeveqe geş vedibe”.

Piştî danîna gelek dû û dermanên kalê nûranî jî cure-cure kulilk û pincarên datîne ser birinên Eco. Birinên wî nava wedekî şûnda qenc dibin. Ew hinekî ser piya dikeve. Tevî wan meriva dibe. Lê kalê nûranî wî ber çavên xwe nake. Xwedê çi daye, ewî jî tevî wan dixwe. Wekî ew xwe jî wana hilnekişîne, cuda neke.

Sibekê ew dîsa tevî kalê derdikeve, bereka çiya wekî seva dû û dermana gul-kulilka berav bike. Ew nêzikî kalê dibe. Herdû destên wî digire, maç dike û dide ser çavên xwe. Ji destûra çûna xwe dixaze. Kalê nûranî bi dilekî şewat hêsira dibarîne. Derheqa hovîtiya ekserê tirk Eco ra qise dike. Eyan dibe, wekî çend roja piştî çûna Eco, ekserê tirk ser gundê wan da jî girtiye. Ew merivên gundî ber wê xezê xilas bûye. Ew meriva wê rojê gund da nebûye. Wê rojê da kalê nûranî, Eco çawa kurê xweyî helal qebûl dike.

Ew jî heta fesla payîzê tevî wan hêsîra, xwe zaxên sere, tarî da vedişêre. Bi cure-cure pincarên ku çiyayê Kurdistanê şîn dibin, bê ebûra xwe dike.

Payîza derengî ew jî şevêkê tevî wan hêsîra xwe Erez dixêre. Tevî wan hêsîra ra têne Ermenîstana Sovêtiyê. Dewlet jî wan hêsîra hineka dişîne gundê me da. Eco jî tevî wana tê

gundê me.

Eco demekî mala apê Etar da dimîne. Emrê wî îdî bîstî derbas bibû. Ew gihîştibû miqamê emrê xortiyêyî herî cawdar. Bi saya rûnermiya xwe ew nav wedekî kin da hurmeta cimaetê gund û serweriya gund dest tîne. Serweriya gund erdekî piçuk dide Eco da. Merivên gunde xêrxaz beravî cîkî dibûn, ser wî erdî wî ra xanîkî piçûk datînin.

Êvarekê çend rûsipiyên gunde pir qedir têne mala Hesên. Werdek wana dibîne, lê armanca hatina wana nizane. Mêvanê hatî xêleke xurt tevî Hesên hewal didin. Dêmekî gelekî geş xatirê xwe Hesên dixazin û diçin.

Sivetirê berî nîvro, Hesên Werdekê û kulfeta xwe Eyşanê gazî cem xwe dike (Eyşanê wek ewlêda xwe Werdekê hez dikir. Ewa ji ewladên xwe cuda nedikir), armanca wan rûsipiyê ku êvarê hatibûn, wana ra qise dike. Boynet Eyşanê û Werdekê îdî her tişt eyan dibe. Ewana tenê serê xwe berjêr dikin. Lal-cîm hewal nadin. Dibine hogirên mêtalên kûr.

Çend roja şûnda cimaeta gund Werdekê tînine mala Ecoye ewqasî jî ne mezine, ne xemilî. Wê rojê da bext û taliqê wana hevdura têne girêdanê. Ew pişt didine piştê hevdu, dest bi keda helal dikin. Nav emir da rastî gelek qewmandinên tele û şîrîn tên. Tevî hevdu wan qewmandina ji xwe dûr dixêrin. Geh şa dibin, geh jî pejmûrde dibin. Çend ewledê wan têne dinê. Lê bi nexaşiyên zaraye cure-cure va wede zûtir dinya xwe diguhezin. Du ewladê wan, Evdile û Qazê dimînin. Evdile jî nolanî bavê xwe rûnarmî û kedhez dibe. Ew

dibistana gunde hevtsale bi zanebûneke pir baş va kuta dike. Tevî bavê xwe malhebûna gundîtîyê da dest bi keda helal dike. Sal derbaz dibin, Evdile dibe xortekî berbiçav. Nav xortên gund da hurmet û navekî gelekî baş bi dest tîne. Her êvar hevalên wî, mala wan da dicivin. Heta nivê şevê tevî hevdu hewal didin, laqirdiya dikin, car-carana jî ji dayika Werdek venagerin. Giliya davêjinê. Mala Eco dibe mala xorta, ciyê eşq û şahiyê.

Telebextî ra emrê wan eşq û şahiya gelekî dirêj nakişîne.

Sibekê caweke reşe nevixêriyê li dinê bela dibe. Her derê meriv kom-kom dibin, keserên kûr dikişandin û derheqa dest pê bûna şerê cihanêyî duda da hewal didan. Gunda da mêr û xortên berbiçav hêdî-hêdî kêr dibin.

Dewsa eşq û şahiyê tenê dengê şînê û girî tê. Hinek malên gund derê xwe girêdidin, diçûne ciyên dine, wekî ebûra xwe bikin. Rojekê ev cawa nevxêriyêye bêwede dibe mêvana mala Ecoyê belengaz. Evdile ji bo ekseriyê gazi nehiyê dikin. Ew jî tevî hevtangên xwe boynet welatê xweyî delal ji faşîstê devxwîn aza bike, çekê hildide û bi efatî dest bi şerê heqiyê dike.

Rojekê name parevekirî dergê apê Eco jî dikute. Neferê malê lez berbi derwaze direvin, dilekî bê sebir derwaze vedikin. Postager bi dêmekî pirî geş rûyê wana vedibişire û mizgîna xwe dixaze. Nama Evdile dide wan. Eco û Werdek namê ji destê hevdu direvînin. Maçdikin û didine Qazê. Qazê jî dibistana gunde hevtsale kuta kiribû. Ew namê bi dengekî

zelalî, paqış hêdî-hêdî dixwîne.

Evdile dinivîse: *“Dayê, bavo, ez ji we gelekî rica dikim, wekî hûn derheqa min da tu mitala nekşînin. Ez sax û silamet gihîştîme ser axa Ûkraynîayê. Ew welata gelekî xweşa min tê. Çimkî ev erda nolanî deşt û zozanên meye ku em lê dijîn. Vira terazunên bedew, çem û kaniyên avgure eynî nolanî cem û kaniyên mene. Şev û roj dikine xuşe-xuş dikişin. Ça ku bêjî dikine gale-gal. Heta çavê te dibire, daristane. Fêkî û rezên wiyî bê hudud û bê hesabe. Darên merxê û darên sipîndarêye usanî bilindin, wedê ku lê dinihêrî kumê meriya serê meriya dikeve.*

Nika gelek hevalên min hene. Ewana min weke birayên xwe hez dikin. Nahêlin ez destê xwe bidime qet tu tiştêkî. Em tevî hevdu nolî bira derbaz dikin. Tawiya meye ewqasî jî ne sare. Şinêlên me ji orxana teye hiriye gelekî germtire.

Îvan, Şalîko, Hagop, Nîzamî û Qadîrbêk jî we silav dikin. Destên we radimûsin. Çendekî pêşda hinekî germaya min hebû. Wana nizanibûn çawa bikin, wekî ez zû qenc bibim.

Îvan hinek av katloka xwe da keland, dewsa çayê da min. Min ew ava wedê ku vexar, deqîqekê min usa zanibû, wekî ezî malim. Qey tuyê bêjî, te misînê meyî reş da dîsa çaya çetriyê vala kiriye, daye ber min û ez wê çaya teye pîr tem, dîsa vedixum.

Dayê can, tu fikra min neke, hezkirina xwedê emê

faşîstê devxwîn hêlîna wan da bixenîqînin. Heqî û neheqiyê bê ortê, her tiştê eyan be. A wê hingê, kurê teyê enî vekirî vegere mal. Tu jî çawa dayika kurê egît pir şabibî, xwe bipesinî.

Rica dikim, bersiva nama min derengî nexînin. Min ra binivîsin, cem we çi heye, çi tunene, ji hevalên min kî çûye eskeriyê, kî ne çûye. Keçên ku tevî min dixandin, çi va mijûlin. Gulê, keça apê Emere çi...”

Qazê namê dixwîne, xilaz dike, lê navê Gulê nolî zengilekî deng zîz nava guhê dayika Werdekê da dike zingînî.

Wê îdî bawer dike, wekî Evdile wêyî delalî ewqasî jî rijî nebûye. Wî gelek tişt zanibûne, lê xwe nedaye kîvşkirinê. Berî çûna xwe, îdî xwe ra keç jî bijartîye. Fikiriye, çawa dibêjin “Lap çavê kewê da lêdaye”.

Dayika Werdek îdî wê rojê da dest pê kirî mêla xwe dide ser Gula, keça Emerê cînara xwe.

Ewê ser kaniyê, destê nav keçên hevalên wê da, kîderê dibe, bila bibe, ku wê dibîne, gazî cem xwe dike, destê xwe stûyê wê ra dibe, ewê hemêz dike. Bi dilekî alavî netêrbûyî netka wê her sûretên wê têr-têr maç dike. Çavên pir birçî va bejin û bala wê temaşe dike. Dîsa vedigere dubar-dubar çevê wê dinihêre û vedibişire. Bin lêva va çawa bêjî dua dike. Car-carana jî herdu destên xwe bilindî jor dike, navê xwedê dikişîne.

Bi vî teherî gelek rojên tele cansotî tên û dibuhurin. Namên Evdile geh zû, geh jî dereng-dereng tên. Dê û bav bi

wan namê sê qulç va şa dibin. Geh wan dîkine berîka xwe, geh jî êvarê datînine bin balgiyê berseriya xwe. Xewnê da Evdilê xwe dibînin. Bi bejin-bala, cek û forma wiye eskeriyêye bedew ra şa dibin. Carana jî di xewnê da jî sîlaha hildidin, tevî wî mîiqabilî faşîstên devxwîn şerekî hêle dîkin.

Caranan jî dibînin, wekî Evdile îdî hatiye. Mala wan da meclîseke gelekî giran heye. Hemû hevalên Evdile hatine, Cincoyê defçî dîsa ringe-ringê defê dixîne. Mîna hercar ser çoka xwe dişkêne. Hewşa wan da govendeke giran digere. Gulê serê govendê dikişîne. Ew û Evdile bin çawa va dizî-dizî hevdu dinihêrin, vedibîşirin. Evdile jî dikeve govendê. Bi eşqeke gelek hewes ew jî direqise û Gulê mêze dike. Ew bin van hesret û xwestinê da rojên xwe derbaz dîkin. Hatina lawê xweyî mêrxas bê sebir dipên.

Roje ji rojên derbaz bûyî, ewqasî jî fîrq nebû. Posteger dîsa dergê apê Eco dikute. Wê rojê apê Ecoyî mal nîn bûye. Dayika Werdek xwe (çawa bêjî ewî îdî derî kutana posteger nas dîkir) bi lez derwaze ra digihîne. Zû-zû jê dipirse, lawo, lawo, name heye, yanê na?

Vê carê postager serê xwe bilind nake. Mînanî berê eşq û şa rûyê dayika Werdek nanihêre. Tenê “belê-belê” dibêje. Nameke sê qulçe, ne tirê namên berê zû-zû ji tûrikên xwe derdixe. Dirêjî dayika Werdek dike, elbêra ji wê dûr dikeve.

Bedena dayika Werdek teviziyê tûj didine ber xwe. Destên wê diricifîn. Lê dîsa namê maç dike, dike paşla xwe, rast datîne ser dilê xwe. Zû-zû berbi mala Emer direve. Gazî Gulê

dike. Namê didê. Gulê dengekî zîzî-ferê bi heweseke hezkirî va name bilind dixwîne:

“Dayik û bavê meye pir delal”. Gulê nişkêva vediciniqe. Name ji destê wê dikeve, sist dibe. Demekê şûnda name hildide û bi dengî lerizî dixwîne:

“Îdî ji qeweta me der bû... Me ruhê xwe boynet hevalê Evdilla nedihêvişanda. Lê...

Me hogirên xweyî pir delal, bi dilekî kulî-birîn sîngê çiyayê Karpatê ser kanîke têrave zelal, bin dareke merxê da sîparte axa Ûkraynîayê. Ewladê we, birayê meyî nebîrkirî rastî jî esil mêrxas bû. Egît, welathez û dilovanekî pir mezin bû.

Dayik û bavê meye delal. Em gişk, ewledê wene.

Axir azadî bê qurban nabe!..”

Dayika Werdek wê cawa nevxêrîye tewat bi egîtîke pir bilind qebûl dike. Çimku ewladê wêyî tûnsîz, ruhê xwe bona azaya welatê wêyî Sovêtiyê qurban dabu.

Wê rojê da dest pê kirî, ew kofiya xwe datîne, cilên reş xwe dike û bi culqetekî pir mezin va dubar tevî xebata malhebûnêye tomerî dibe.

Ew îdî berê gelectir, malhebûnê da destbi xebateke gelekî hêleye tomerî dike. Çawa pêşvana xebatê wê dişînîne Moskovayê.

Ew dibe tevgela temaşegêha destanînên merivên Sovête. Çend cara tê bijartinê dêpûtata sovêta gund, usa jî dêpûtata nehiyê û gazîkirinekê dawî da jî dêpûtata (wekîl) komara Ermenistanêye tewra bilind.

Piştî cawa nevxêriyê Ecoyê belengaz ewqasî gelekî najî. Qazê îdî mêr dike, dibe xweya kom-kulfet. Dayika Werdek mal da tenê dimîne. Gelek şevên bê xewe, tel derbaz dike. Car-carana dîsa xewnê da dibe pîrik. Heleçana zarên Evdile dihejîne. Kilamên zaraye gelirî wan ra dibêje. Ew mezin dibin. Wan ra def û dewetê lêdide. Evdile û Gulê dîsa dikevîne ser govendê. Direqîsin. Cimaet dirava ser ser wana direşîne...

Gundê meyî bintara çiyakî ne piçûk da ser gereke mezin ciwar bibû. Li berpala wî çiyayî kevîrê giloverî reş hebû. Cimaeta gund wî kevîrî ra kevîrê Evdilê Eco digotin. Çimku wextê da ji cahilên gund kesî nikaribûne wî kevîrî weke Evdile ji cî bilind bikin. Loma jî cimaeta gund jê ra kevîrê Evdile Eco gotine.

Dayika Werdek her sibe zû, berî derketina royê dihate cem wî kevîrî. Ew hemêz dikir. Destên xwe lê digerlandin. Rûyê xwe lê dixistin. Hêsir dibarandin. Têr-têr maç dikir û jê dûr diket.

Sal buhorîn. Zemîn emrê xwe da. Dayika Werdek ronaya herdu çavên xwe winda kirin. Lê dîsa jî ew nolanî berê her sibe zû berî derketina royê tevî kurê Qazê (Evdilê biçûk) dihate cem wî kevîrî. Hemû hereketên xwe berê diwekilandin û diçû.

Rojekê dayika Werdek gazî rûspiyê gund dike. Ji wana hîvî dike, wekî wedê defîn kirina wê, ewî kevîrê reşî gilover daynine ser kêlka wê...

Cimaeta gund wê weysêta dayika Werdek diqedine.

Nika bineliyê gund, dewsa wî kevirê reşî gilover heykelê şehîdê şerê cihanêyî duda dana dasekinandinê. Tevî navê şehîda navê Evdile jî hatiye nivîsarê. Dora wî gelek darên merxê û fêkî cure-cure nikandine. Bê hed û bê hesava gul, sosin û rihanê reng-reng reşandine.

Her sibe, zû xwendevanên gund cure-cure baqên gulên nûh destê wan da datînin ber. Serê xwe xar dîkin. Selama didinê û jê dûr dikevin.

Tu kes nayê bîrkinê, tu tişt ji bîr dernayê.

1978,

Rewan.

P.S.: Navî Evdilê Eco jî nav navên şehîdê şerê cihanêyî duda ser singê tehtekê reş hatiye nivîsarê.

FOLKLOR

KLAMA KULORÊ

Hey kulorê, wey kulorê,
Kulor pêjê fike-fike,
Dere qeytan, dor binîke.
Perê çadirê ser da sîke,
Kulorê bîne, me nîvîke.

Navê kulor pêjê sebre,
Ev sê sale, maye sewre.
Wê nekiriye gilîk-debre,
Kulor xariye kelbê gewre.

Kulor pêje keça Gozê,
Kulor kiye tekiya bozê,
Pirtkê kulorê çûn newrozê
(Şev-ro tenê ew radize)
Klor pêjê keç Zînê,
Kulor kiryetayê miqînê,
Pirtkê kulorê çûn havîne.

Navê kevaniyê Goze,
Dêrê mezer quna wize.
Li meydanê dike toze,
Kulor xariye kerê boze.

Hey kevanî, wey kevanî,
Nanê teşta te tew kanî.
Kul bigire, te wî canî.

Kulor kiriye nava sêla,
Hewar daye, du, sê êla.
Welgerînin vê kulorê,
Bi du mera, danzde bêra.
Kulor besî def, deweta,
Yek, du şaya, sê çar xêra.

Navê kulor pêjê xate,
Kulek di qirkê da hate,
Kulor xarne kelba cote.

GOTÎNÊN KAL Û BAVA

Çiqas salî nav axê da bimîne zêr,
Qîmetê xwe unda nake ew têye kêr.

Esilzade çiqasî jî bihecîqe, bibe hejar,
Kîbûna xwe ew bîr nake, kilyameta zêr tîne zar.

Xwîna kêda çi ku hebe, zû û dereng dide dere,
Çiqas kerbe, eqara xwe naguhere zêre zere.
Evîrê va gelek diçin ardû, qirşa,
Lê sibê zû hindik tînin ardû, qirşa.

Giliyê êvara, dikevîne qulê dîwara.

Nevsên girîng, dixulîqin gelek hindik,
Hemû ciya nayê dîtîne lelê rindik.

Kulfeta bedesil, meqesa emrê mêrê xwe ne,
Wî wede zûtir kal dike.

Xwedê meriya şaş dike, faş dike,
Dawiyê erdê ra kaş dike.

Meriv desta dişimite, piya dişimite xwe digre,

Lê wedê ku zimîn dişimite îdî nikare xwe bigre.

Malê pir ne ewledê qenc ra, ne jî ewledê xirav ra neke,
Ewledê xiravê wî malî zû belake,
Ewledê başê wî malî zêdetir xwe ra mil beravke.

Hût berada, mêrxas gêlada,
Beq, kûsî nav gole genya da digihîjin.

Xelqê ra yê bi şeye sawûn têne ber kraşoyê,
Yê bê te, sawûn têne ber kraşoya min.

Merivê aqil, dewê xweyî cêribandî,
Nade mastê xalqêyî necêribandî.

Destê dayika jêkin, nê ewlada xin.

Merivê esilzade şera ditemrîne,
Bedesil şera qaîm dike.

Keça bakire, nolî toyê ser maste,
Birincê demêdaye.

Serê pirayî ber derê nezanaye.

Xwîşk wedê ku diçe mala mêrê xwe,

Birên xwe berîka xwe da dibe mala mêr.

Xwedê hezar derd daye, hezar yek jî derman.

Gotiye cûzîke dest benda daye.

Agire, aqilê te heye piyê xwe nekê.

Çawa difikirî bifikire, hoqek çarsid kirame.

Nanê xwe bide ewî kesî bixwe, paşê bişêkrîne

Gulê bide ewî kesî, bînke ewê bihebîne.

Şûştin, veşûştin reng û rû,

Xarin, vexarin rex da çû.

Kêrê ra gotin, çavê te ronik be, dibêjin te deşikek aniye.

Ker dibêje, deşik anînê min aniye, lê dîsa barê minî piştî mine.

Bike kala, bixwe mala, çî terane cahilê aqil vala.

Baro, neyê pişa min, tu ku hatî pişa min,

Ezê te temam dinê bigerînim.

Heta hate dora me, av kete çira me.

Berê garanê berbimal bû,

Jina gêvîn şuxulkar bû.

Kengê sala hingê,
xalêm bere xalê te da kire qulasîngê,
Mêşê ser kire vînge-vîngê.

Pîra hiz-hîzî, heta xwe lerizî,
Diza nanek xar, kerîk dizî.

Xaraya bi xêriye nanihêre, bila dûyê wê rast derê.

Nan, nanê lêje,
Got, goştê gêja.
Xemil, xemla,
Çûk dirêja.

Gêziyê ra gotin mêrê malêyî. Malxuya malê zû rabû, serê
xwe ber wa xarkir.

Çîre-çîra kotanê, deng çû Hemedanê,
Hê got, la min bê xweyî, bê xudane.

PÊKENOK

(qelfok)

Cihizê bûkê barê dîke, dîk di bin da fîke-fîke.

Xwedê te pamê pişka, refesa dîka, nikûlê qijika biparêze.

Malik avayo, ew çi şîr bû te dot,

Ew çi bişkul bû te kire nav.

Mala dîna hev dane ber pihîna.

Şeve reşe, şûve reşe, miya qere, berxe bere, Emere malê
xwelî sere.

Wedê deva, Emerê lawa, wedê xaşa Emerê başa, wedê
kirinê Emerê xatûnê.

Here avê çirtika bavê. Tevin-teşî gilêm diêşî.

Ne xate, ne fate, şuxul bûye berbate.

Te bi wî zimanî lê canê, konkê reş xwe ra danî.

Wey la min porê te kurkirê, paşopê kerekê siyar kirê.

Qale benîşt dêv kirê
Ser mala bavê da rast kirê..

Yek mir, yek mir dest, wek revî, yek hate hate dest.

Nanê bê xoy dixê, lê derheqa şorayê da hewal dide.

Xeber xweş xebere, lê gotî ne ruhberê.

Malik avayo, tu jî îdî erebê hinekî daxe rastê. 'Tu kexma
tewê bikeve. Merhemetî gula bîne, him bahare, him havîne.

Qelender dimire, qeliyê didinê.

Kerê kulek, orta min û te da ma milek.

Min got, ezê fîro firkim, nizanî bû ezê guliya xwe kurkim.

Çûme êş, kombeze li pêş.

Serî qûçe, bînî pûçe.

Malê da tune avranok, navê jinê dîndarok.

Tîliya min çavê dêra, mêrêk u dît qîzêra.

Nebe dilê zikê xwe, bilind bigre navê xwe.

Xwedê ku got: qûlê here,
Toyê bikî qure-qure.

Nebe pûtiyê mala xelqê, wê timê te bikenin,
Mala xwe da rihet rûnê, wekî te nekenin.

TÊ TERXISTÎNOK

Ew çîye per û bakên vê tunenin, lê tamam dinê digere.
(mitale, raman)

Kevir dixim naşkê, avê dixim dişkê. (kagiz)

Aşe çar feraşe, dudu pêşin, dudu paşin. (mange, çêlek)

Ev çîye, serî hevt temaye? (xoy)

Ev çîye ji hemû tema temtire. (şîrê dê)

Birceke sipiye, bê pencere, bê deriye. (hêk)

Ev kîjan bînbere ku malê çê dike, ne derî dihêle, ne
pencere. (kormê hevrûş)

Ev çîye riya evdura girê dide. (pire)

Her hemane, ber çemane, ne gur duxe, ne diz duxe. (pire)

Binzik çerme, ser sirîne, çi lê dikeve dibe birîne. (jûjî)

Odeke şûştî-mûştî kalek tê da rûniştî. (kûsî)

Difire çivîke, datîne mişke. (çivîka şevê)

Ro nabîne, şev dîbîne. (çivîka şevê)

Vira got xîşt, wira got xîşt,
Ber dêrî kulê guşt. (kêzî)

Hilintir, milintir, kur ji bavê bilindtir (dû)

Ew kîjan teyrê ku xwedê jê xezna xwe rojê sê cara ruzayê
wî dişîne. (bûme kor)

Êlê dixemilîne, xwe tezî dîmîne. (derzî)

HELBESTÊN BÎ AZERÎ

GOÇ DOSTUMUN GOÇ HƏJARI

Həjarê Şamilin “Diaspora Kürdləri” və “Yalnızam, təkəm, tenhayam” kitablarının çapdan çıxması münasibəti ilə.

Kitabınız çatdı mənə,
Təbrik, təbrik goç Həjarım!
Oxuduqca hər kəlməni,
Unutdum ki, ixtiyaram.

Gumrahlaşdım, cavanlaşdım,
Dizlərimə gəldi taqət.
O dağlarda gəzdim, coşdum
Bütün dünya oldu cənnət.

Qartallardan qanad aldım,
Qanadlandım zirvələrdən.
Könül sazım havalandı,
Vətən axdı pərdələrdən.

Yükü ağır sözlərinlə,
Bəndlər yıxdın, dağ aşdırdın.
Vətənimin düzlərini
Qarış qarış dolaşdırdın.

Səğol, əziz qardaş oğlu,

Sağol, Şamil yadigarı.
Saf mayadan töryənin
Həqiqətdir tək meyarı.

Sən həqiqət yolçususan,
Yolun vətənə doğrudur.
Gənc yaşında bir ulusan,
Fikrin, əməlin doğrudur.

Ot öz kökü üstə bitər,
Əskik olmaz kül ocaktan.
Olacağı yaradanlar
Mədəd ummaz olacaktan.

Sən bir dolu xəzinəsən,
Sözün qızıl, fikrin almaz.
Hər şeysiz olar, hər şeysiz,
Vətənsiz olmaz, heç olmaz.

Silah etdin qələmini,
Bu yolda qoydun başını.
Axıracan verəcəyik
Azadlığın savaşını!

ZƏMANƏNİN ƏN BÖYÜK BİR MƏRDİ VAR

Allahındır atəş, hava, su, torpaq,
Əzəl başdan mən torpağın oğluyam.
Tapındığım ilk tanrım da günəşdir,
Bu çirağın, bu ocağın oğluyam.

Haqqın nuru sozalmayıb eynimdə,
Haqqın donu köhnəlməyib əynimdə.
Həqiqəti daşıyıram çiyinimdə,
Əyilməyən bu bayrağın oğluyam.

Övladıyıq, sahibiyik dünyanın,
Dərdlisiyik neçə ganlı rö'yanın.
Nə fərgi var, hansı düzün səhranın,
Hansı çayın, hansı dağın oğluyam.

Müsibətdir tökdüyümüz qan bizə,
Şər qurbanı verməyib ki, can bizə?
Ədalətdir şöhrət bizə, şan bizə,
Mən nə solun, nə də sağın oğluyam.

Qəlbi sınıq, bağırı yara gəlmişəm,
Dağlar aşıb, günü qara gəlmişəm.
Günü doğan bir diyara gəlmişəm,
Bu vətənin, bu oymağın oğluyam.

Bu diyarda neçə xalqın yurdu var,
Hamısının bir sevinci, dərdi var.
Zəmanənin ən böyük bir mərdi var,
Xoşbəxtəm ki, mən bu çağın oğluyam.
1994.

Kürdcədən çevirən: Hüseyn Kürdoğlu.

KÜRD ŞE'RİNİN GÜNƏŞİ

*Böyük kürd şairi Əhmədê Xaninin “Məm və Zin” poemasının
300 illiyi münasibəti ilə.*

Ey ustad, qıyarammı bənzədim dağa səni,
Sən dağlardan ucasan, günəş hara, dağ hara?!
Oxşada bilərəmmi çaya, bulağa səni,
Sən dəryadan dərinsən, alay-alay dağ ara.

Nəsil-nəsil kürdlərin timsalıdır Məm və Zin,
Sən onların eşqini gövrək bir sazla çaldın.
Məhəbbətin oduna nəş'əylə yandın özün,
Kürd qəlbi budur deyə dünyaya bir od saldın.

Həririylə Ciziri baş əydi qüdrətinə,
O goca Fəke Təyran bağrına basdı səni.
Tanrı da əhsən dedi uca məhəbbətinə,
Zaman-zaman yığırıq əkdiiyin qızıl dəni.

İstiqlal həsrətiylə sən de toprağa döndün,
Sən doğma dilimizin dirilik bulağısan.
Həm gözdə, həm könüldə sönməz çırağa döndün,
Başımızın tacısan, sinəmizin dağısan.

Üz tuturam köksündən qanlar axan millətə:
-Ey xalqım, özünə gəl, sənsən əbədi Xani!

Heykəlin baş qaldırar bir gün əbədiyyətə,
Dünya boylanıb deyər: budur Əhməd Xani!
1995

Kürdcədən çevirən: Şamil Əsgərov

PƏRİ

*Ömür-gün yoldaşım əziz Dilbər xanimin unudulmaz
xatirəsinə.*

Ata kürd oğluydu, ana türk qızı,
Qaraqaş, qaragöz incə pəriydi.
Göydə ulduzumuz qoşa yanırdı,
Halal bir ocağın bəxtəvəriydi.

Üstündə ilahi bir ismət nuru,
Alnında uca bir qadın güruru;
Qəlbi dupduruydu - çeşmədən duru, -
Xalığının ən gözəl bir əsəriydi.

Hər sözü söhbəti, ülfəti narın,
Yanardı dərдинə dostun, simsarın.
Məktəbdə nə qədər gül balaların,
Qohumun-qardaşın can-ciyəriydi.

Gözümdə qalsa da neçə muradım,
İki oğul payı qolum-qanadım.
Xoşbəxtəm, onunla qoşadır adım, -
Eşqinin, andının səməndəriydi.

Sinəmə dağ çəkdi qəfil hicranı,
Övladı yaşasın torpağı sanı.
Getdi bir şairin canı-cahanı,

Biçarə Balanın şux Dilbəriydi.
1996

SİĞİNMIŞAM SÖZƏ MƏN

İnsan ömrü yüz döngəli bir yoxuş,
Mən 60-a təzə gəlib çatmışam.
Qalaq-qalaq kitablarım hanı bəs,
Karvan keçib, Allah, nə çox yatmışam?!

Təzə-təzə boylanıram yuvadan,
Yer üzünə od ələndi havadan.
Atam getdi, qayıtmadı davadan,
Əzəl gündən dərdə-qəmə batmışam.

Ağır illər gəlib keçdi ömürdən,
Həddi nəydi dünya çıxsın əmrədən.
Qara günlər betər oldu kömürdən,
Ağ sulara gözümdən sel qatmışam.

Qəməm dərya, sevincimsə bir ada,
Bir mələklə könül yetdi murada.
Əldən uçdu, qalmadı bu dünyada,
Dərd əlindən fələyə daş atmışam.

Zaman-zaman düşdüm oda-közə mən,
Dərd önündə çökdümmü gör dizə mən?!
Sığınmışam aylı-günlü sözə mən,
Qardaş elin ətəyindən tutmuşam.

1993.

Kürd dilindən çevirən: Hüseyn Kürdoğlu

CABBAR BABA

*Azərbaycan xalqının böyük rəssam oğlu və Kürd xalqının
sədaqətli dostu Cabbar Quliyevin 75-illik yubleyinə ittihaf.*

Başı qarlı nəhəng dağsan, əyilmezsən yağı, yada,
Şirin sulu bir çeşməsən, axacaqsan bu dünyada.
Yorulmadan sən fırçanla cansızlara verirsən can,
Sənətinlə fəxr eləyir ana yurdun Azərbaycan.

Tanrı səni yaratıbdir halal süddən, saf mayadan,
Damla-damala, qətrə-qətrə ilham verib öz nurundan.
Günəş qədər vüqarlısan, ziyan düşür qoca yurda,
Cabbar baba, sənətinə ölüm yoxdur bu dünyada.

Kaş birlikdə biz gedəydik baxtı yatmış Kürdüstana,
Şad müjdəylə qayıdaydıq həm Təbrizə, həm Zəncana.
Laçın, Şuşa, Kəlbəcərdən yox olaydı yağı izlər,
Dağ döşündə rəqs edəydi şux gəlinlər, incə qızlar.

Xankəndində biz açaydıq şe'r, sənət məclisini-
Mən qələmlə, sən fırçanla nəqş edəydik el dərini.
Cıdır düzü, Murov dağı qoy olaydı at oylağı,
Yurdumuzdan, yuvamızdan çəkiləydi murdar, yağı.

Hər ikimiz eyni suyuq, bir torpağın övladıyıq,
Yurdumuzdan didərginik, əzablıyıq, qayğılıyıq.
Böyük tanrı erməninin ocağına bəla salsın,
Bundan sonra yubleylərin İrəvanda tez-tez olsun.

SALATIN, ƏZİZ BACIM

Qəhreman Kürd qızı Salatının xatiresinə.

Vətəninə çox sevirdin
Gözlərinin nuru kimi,
Gecə-gündüz qeyrət ilə
Hay salırdın koru kimi.

Qorxu-ürkü tanımadan
Hey düşürdün dağa-daşa,
Neçə-neçə kənd şəhəri
Dolanırdın başdan-başa.

Sən deyirdin, şad yaşasın,
Kimsə yetim qalmasın qoy.
Yol üstündə, gədəklərdə
Yolçular kül olmasın qoy.

Sülh, qardaşlıq zəfər çalsın
Yer üzündə hər guşədə,
Haqq var olsun, şər utansın,
Gəlib yetsin belə vədə.

Hər bir millət dinc yaşasın,
Qonşulardan çəkilsin göz.

Bir süfrədə otursunlar,
Dostluq olsun ən əziz söz.

Əziz bacım! Bəxt gülmədi
Niyə sənin üstünə bəs?
Qatil, cani olan yerdə
İş gətirir həmişə nə's.

Sənin o mina gərdənin
Birdən oldu qıpqırmızı.
Qəsd, qərəzli daşnaq əli
Quruyaydı, vətən qızı!

Həmin anda çaylar durdu,
Meşə əsdi, saldı haray.
Göy sızladı, daş titrədi,
Çəmən, dərə dedi: vay!, vay!

Göyərçinlər qanad çarpdı,
Maral dağı dörd dolandı.
Bülbül susdu, güllər soldu,
Duru axan su bulandı.

El-obalar hönkürüdü,
Qoparırdı aləm, şivən,
Haqq evində arxayın yat,
Yada qismət olmaz vətən.

Dövrən çox da belə getməz,
Qəlb sözümü söyləyir dil:
Laçının igid Kürdləri
Alacqdır heyfini, bil.

Kürd dilindən çevirən: Şamil Əsgərov.

GÖZÜM YOLDA QALIB

Xeyli vaxtdır, gözəl yardan yoxdur xəbər,
Arzularım, diləklərim gedib hədə.
Dərd-kədərdən, qəm-qüssədən yoxdur aman –
Yaxın ikən ayrı salıb bizi zaman.

Xoş baxışlar, şirin anlar çəkir məni,
Bircə dəfə kaş görəydim yenə səni.
Aramızdan yox olaydı qalın sədlər,
Uzanaydı, bitməyəydi dəqiqələr.

Böyük tanrı rəhm edəydi bir də bizə,
Oturaydıq qabaq-qənşər bir üz-üzə.
Yurdumuzdan çəkiləydi quduz, yağı,
Qovuşaydıq ömrümüzün təmkin çağı.

GÖZƏL XANIM

Eşq aləmdir, atəşi var, əzabı var,
Saya gəlməz sevinci var, cəfası var,
Heç unutmı hər yoxuşun enişi var,
Meylin varsa, bu naz-qəmzə nəyə gərək?

Sevən qəlbə ləkə salma, yanılırsan,
Xoş xasiyyətli, şux qamətli, bir tərլansan.
Vaxt çatanda saralırsan, soluxarsan,
Meylin varsa, bu naz-qəmzə nəyə gərək?

Sevən kəsə tə'nə etmək, qəbahətdir,
Yardan ayrı yaşamanın özü dərdədir,
Qara gözün bir baxışı qənimətdir,
Meylin varsa, bu naz-qəmzə nəyə gərək?

Talə mənə xoş baxıb, ya qəst eyləyib?
Eşqin ilə ürəyimi məst eyləyib,
Şükür, şükür, səni mənə rast eyləyib
Meylin varsa, bu naz-qəmzə nəyə gərək?

Aç könlünü həyatımı cənnət eylə,
Eşq qismətin vergisidir, minnət eylə.
Sadiq dostu ürəyini açıq söylə,
Meylin varsa, bu naz-qəmzə nəyə gərək?

VÜSALA İNAN

Qara gözlüm, zəmanə tək sən də olma e'tibarsız,
Səndən qeyri mənə yaddır, hər nazənin, hər pöhrə qız.
Əzablara düşən qəlbin məlhəmisən, dərmanısan,
Dizlərimin taqətişən, ürəyimin imanısan.
Mənə niyə yadlaşmısan, şeytana lə'nət, min lə'nət.
Yaradana and içirəm, sözlərimdə yoxdur qələt:
Tamarziyam bal dodağa, o tək xala, qara gözə,
Kaş deyəydin, ulu tanrı, birlik nəşib eylə bizə.
Bədbinliyə qapılmıram, Allah rəhim, həm kərimdir,
Bir məsəl var: "su axan ərxdən bir də axar" bu yəqindir.
Dalğa heç vaxt bir sahilə daim döymür, bir az dayan,
İnanıram, bir gün yenə sevinərik, sən də inan.
1998.

AZƏRİ GÖZƏLİ

Gəl bu gecə qonağım ol, sənə baxım doyunca mən,
Ey gül üzlü, həmdəmim ol, öpüm qara gözlərindən.
Ah-naləmi nağıl edim, halım olsun sənə bəyan,
Sənsiz keçən hər bir anım mənasızdır, buna inan.

Gəl, bu gecə qonağım ol, birgə gedək Kürdüstana,
Həsret dolu bir ürəklə qədəm qoyaq o məkana.
Göz yaşını məlhəm edək, şəfa verək ərənlərə,
Qəmli günlər yurdumuzdan uzaqlaşsın qoy bir kərə.

Gəl bu gecə qonağım ol, gedək ərler diyarına,
Tər çiçəklər hədiyyə edək, şəhidlərin məzarına.
Qoca Ağrı daim olsun arzu, dilək məskənimiz,
Gen dünyaya agah olsun istəyimiz, amalımız.

Gəl bu gecə qonağım ol, yenə görək ağır eli,
Sevindirsin bir də bizi azadlığın ilk mə'səli.
Bircə qurtum vətən suyu ikimizə qismət olsun,
Sipan dağda biz defn olaq, məzarımız qoşa dursun.
1997

Acı günlər saya-saya ay düzəltidin, qara gözlüm,
Sən ayları saya-saya il düzəltidin, şirin sözlüm.
Gəl illəri bir-birinə sən calama daha bəsdir,
Qədir bilməz bir kəs üçün bu əzablar boş, əbəsdir.

Talehin öz əlindədir boş dünyaya yox etibar,
Burulğandan çıxmaq üçün sahilləri özün axtar.
Gəm-qüssəyə tez qapılma, ötən günə heyfin gəlsin,
İnsan oğlu ot deyil ki, hər baharda o göyərsin.

Yarı yoldan qayıtmağın özü mərdlik, şücaətdir,
Tay-tayını tapmayanda, vallah, o da böyük dərdədir.
Ömür bəzən kısa olur, bəzən uzun, bu qisməttir,
Ancaq bil, sevgisiz ömür, başdan başa əziyyətdir.
1997.

GÖZƏL

Səni görməyəndə təlx olur halım,
Sən həm keçmişimsən, həm istiqbalım.
Sənsiz bu dünyada durmaq əbəsdir,
Tək sənin varlığın dünyaya bəsdir.

Ənbərsən, ətrindən dünya məst olur,
Qızıla bənzətsəm, sənə qəst olur.
Gövhərsən, heyf ki, xridarın yox,
Zin təki əldə bir ixtiyarın yox.

Bəxt gəlib gedəndir, dünyadır qalan,
Var olmaq, yaşamaq – hamısı yalan.
Hər ana bir dünya sığdırmaq haqdır,
Sevgiylə yaşamaq! Bu yaşamaqdır.

Bu dünya bir heçdir, haqq olan sənsən,
Sən həm gələcəksən, həm də əzəlsən.
Sənli bir an sənsiz min günə dəyməz,
Bu dünya bir saman çöpünə dəyməz.
1995

HEYDƏR BABA, BƏXTƏVƏRİK, ŞÜKÜR GƏLDİN

Heydər baba, elin gözü tərəzidir, danmaq olmaz,
Bir məsəl var: “Hər oxuyan heç vaxt molla Pənah olmaz”.
Böyük tanrı verən əmrə şəkki-şübhə etmək olmaz,
Xalqın deyir, dahi rəhbər, bəxtəvərik, şükür gəldin.

Heydər baba, bu dar gündə, ümüdümüz bircə sənsən,
İgid elin görən gözü, deyən dili təkcə sənsən.
Siyasətdə şübhəsiz ki, nəhənglərdən çox nəhəngsən,
Qaçqın deyir, kökçün deyir, dahi rəhbər, şükür gəldin.

Heydər baba, hər oğula xalq bu qədər mehir salmaz,
Hünər vaxtı qoç igidlər kölgəlikdə yatıb qalmaz.
Mayasından naqis olan el yolunda mə'səl olmaz,
Gözü yaşlı ana, bacı dua edir: Şükür gəldin.

Heydər baba, dünya-aləm, bəh-bəh deyir bu gün sizə,
Qeyrətlisiz, qüdrətlisiz, gərəklisiz elimizə.
Çox xoşbəxtik, tanrı sizi rəhbər etdi indi bizə,
El deyir ki, ey Kürd oğlu, bəxtəvərik, şükür gəldin.

ŞAİR DOSTUM QƏDİR YALQIZA

Qədir Yalqız, naxələfə salam ver keç,
Yaxşı-pisi bir-birindən həmişə seç.
Didərginsən, üzün soyuq, dilin qısa,
Belə günü ərz etmərəm mən heç kəsə.

Qürurlusan, vüqarlısan, dur mərdanə,
Yenilməz ol, bel bağlama bu zamana.
Hər yetənlə dostluq etmə, olma munis,
Mayasından naqis olan, olmaz xalis.

Dün bəxt dedin, o tanrının öz işidir,
Ağrı-əzab, bu dövrənin gərdişidir.
Dür deryada, igid ağır eldə olur,
Köksüz otlar, tez göyərir, tez də solur.

YAXŞI YARAŞIR SƏNƏ ŞE'RİYƏTİN QƏLƏMİ

*İlk kitabının nəşri münasibəti ilə iste'dadlı kürd şairi Bariyə
Balaya dost təbriki.*

Mübarəkdir kitabın, mənim şair qardaşım,
Yaxşı yaraşır sənə şe'riyətin qələmi.
Şair olan kimsənin min bir qələmi gərək,
Hamısından baş olsun həqiqətin qələmi.

Zaman çağırırsın bizi, qoy imtahan eyləsin,
Sınaqdan çıxanları şe'rə sarvan eyləsin.
Yığsın söz ordusunu, gərək üsyan eyləsin
Tarixindən qan daman bir millətin qələmi.

Sən ki böyük Xanidən qaralmaz bir şöləsən,
Könlümüzün evini çıraq-çıraq eylə sən.
Kürd eşqinin sazıyla öz nəğməni söylə sən,
Gövhər saçsın əlində məhəbbətin qələmi.

Dörd qılıncla bölüblər yaralı Kürdüstanı,
Bu məkirli dünyada ədalət varsa hanı?!
Əsrin daş sinəsini yarıb axsa da qanı,
Kürdə də zəfər yazar hürrüyyətin qələmi.

Aslan doğur o dağlar, onun mərdi tükənməz,
İgidlər ocağının meydangərdi, tükənməz.

Ağırdır Ağrı dağdan, Kürdün dərdi tükənməz,
Yazsa da min il boyu müsibətin qələmi.

Bəlkə də şairlərin ilk sözü heyrət olmuş,
Heç kəsdə olmasa da, şairdə qeyrət olmuş.
İlahi töhfəsidir, sənə də qismət olmuş,
Paklığın, ucalığın, ülviyyətin qələmi,
Yaxşı yaraşır sənə şe'riyyətin qələmi!

Hüseyn Kürdoğlu
16.12. 1994.

MÜTLƏQ ZƏFƏR ÇALACAQ ƏDALƏTİN QƏLƏMİ

Sənə bir şer yazmış Hüseyn Kürdoğlu tək,
Ruhundan saflıq axan şəxsiyyətin qələmi.
Nə gözəl sözlər düzür qardaşlığa, dostluğa,
Əlbəttə ki, Kürdlüyə bu ülfətin qələmi.

Qafqaz Kürdüstanında başı dik, üzü ağdır,
O ellərdə iki mərd tarixdə qalacaqdır –
Bir Hüseyn Kürdoğlu, bir Şamil Dəlidağdır,
Mərdliyin, kişiliyin və qeyrətin qələmi.

Onların arzuları mütləq çin olacaqdır,
Parça Kürdüstanımız bir bütün olacaqdır,
Qeyrət qələmimizlə bu mümkün olacaqır
Qırılıb atılacaq əsarətin qələmi.

Mələklərin oğluyuq, tarix bizlə başlayır,
Hər şey söylədiyimiz o ilk sözlə başlayır,
Ümüdünü itirmə, ruhu gənc qoca şair,
Ölməzdir ruhundaki o qüvvətin qələmi.

Ruhundaki qüvvətlə, həqiqətsən, doğrusan,
Hər sözündə Kürdüstan! Kürdüstana çağrısən.
Sözünlə, əməlinlə ədalətin oğlusan,
Mütləq zəfər çalacaq ədalətin qələmi.

Sən Şamilin dostusan, mən Şamilin oğluyam,
Hüseyn Kürdoğlunun miras qalan ağılıyam.
Keçmişdən gəlirəm ki, gələcəyi haqlayam!
Yenilməz, bükülməzdir bu hikmətin qələmi,
Əsir olan millətə sədaqətin qələmi.
Bizim qələmimizdir dəyanətin qələmi,
Qətiyyətin, höcətin, mətanətin qələmi.

Həjarê Şamil

2009



ŞÎRÎNÊ ELÎ – KURDEK GELHEZ

Şîrînê Elî Mustafayêv di avakirina
Komara Qazaxistanê, bi taybetî
serbajerê jêrîn welatê me - Almatayê
da karekî mezin meşandiye û

pişporekî berbiçav tê hesabê.

Tê zanîn, ne ku bêşe mirovê bedew dike, beravajî mirov bi
hunerê va bêşeya xwe bedew dike. Ew taybetmendî di
mirovên puxte de tîn dîtî.

Şîrînê Elî 15 Sermawezê 1951-ê salê da li gundê Aşîbûlaxê,
nahiye Îliyskiy, herêmê Almati hatiye dinê. Malbeta Şîrînê Elî
nolî hezaran malbetên Kurd, ji sedemê siyaseta totalîtarîzma
1937-a bi zorê ji Kafqasê hatibû sirgûnkirin û li erdê
Qazaxistanê da cîwar bibûn. Wê demê bi rastî jî erdê
Qazaxan mêvandar, her Kurda û gelên dîtir bi germî pêşvazî
kir û ji bo wan bû welat.

Hîn li salên dibistanê da Ş.Elî zanîstî û ked hez dikir. Piştî
qedandina dibistanê ew li Cambûlê qebûlî zanîngehê avakirinê
dibe. Di dema xwendinê zanîngehê da (1970-1978) ewî ne
tenê zanebûna xwe xurt dikir, him jî bi heter û tebatkarî xebat
kir û ked rijand. Li serî de karkerê sade bû, paşê bû serkarê
koma karkeran li SMU “Selxoztêxnîka” da. Du sala xizmetê
leşkeriyê kir û deynê hevvelatîyê da.

Piştê xilaskirinê zanîngeha Ş.Elî xebatên cuda cuda kir, erkên têxnîkê mezin, erdezyar (muhendîs), erdezyara sereke bû li zanîngeha “Gîdroribproêkt” beşa Qazaxistanê da. Salekî jî li kargehê SMU “Selezaştasroy” da serkarê şubeyekî bû.

Ew kingê li sistêmê ZAO MAK “Almatigorstroy” de dest pê xebatê dike, ber wî prêspêktîfên profesyonel vedibe. Li vê kargehê de ew dersên jiyana û xebatê derbas dike. Ji cigirê erdezyara sereke heta serkarê SMU Almata qîloz dibe. Wek dîrêktora TOO “Fîrma avakariyê Kêrêgê”, cigirê yekemîn dîrêktora sereke ZAO MAK “Almatigorstroy” xebat dimeşîne.

Di dema hemû salên xebatkariyê de Şîrînê Elî bala xwe daye ji bo bilindkirinê zanebûnê xwe yên profesyonel. Tecbrubeyên (ceribandin) wî têorîk û pratîk, kar û xebatên kompanyayê avakariyê wek ZAO MAK “Almatigorstroy” da eksê xwe dîtiye. Rasterast bi beşdariya wî li bajarên Astana, Almatî, Atirau û Taldikorganê de avahiyên mîmarî yên pir terwende hatiye avakirin û tîr avakirinê. Hêzên kedkariya û ênerjiyê wî bûye mînakên ne tenê ji bo cahilan, her wiha ji bo pisporên pir tecrûbe jî. Ji bo dilê xwe paqij û xêrxwaz ew, mirovên cuda-cuda va zimanê hevbeş dîtiye û di nava heval û hogirên xwe da rêzdariyê mezin bi dest xistiye.

Seva kedên xwe ya pirsalane ew xelatên “Ji bo mêxasiya kedê”, “Glavalmata stroy” stendiye. Jê ra pir cara pesname cure cure hatiye dayîn.

Şîrînê Elî wekî nûnera giranbiha rewşenbîrên Kurda, di

jiyana çivakî yên gelê xwe de bi çalakgerî rolê xwe dilêyize.
Ew endama yekîtiya rewşenbîrên Kurdên Qazaxistanêye û ji
bo pêşxistina çanda gelê Kurd karê biberdewam dimeşîne.
Qedera gelê xwe yên cefakêş ji bo wî mijarekî pir hestiyare.

Şîrînê Elî û hevala wî ya jiyanê, rehmetî Fatmaya Mahmût
du kurên aqilbend mezin kirine. Rûslan sitvanê (kapitan)
ewlehiyê Qazaxistanêye, Elî jî xwendekare.

Ş.Elî kurê gelê xwe ye. Ji bo gelê xwe her fedekariyê hazire;
xêrxaze, dîlnizme, welatparêze, mirovheze.

Ma, ji bo mirovên esl, ji wan taybetmendiyên zêdetir çi
lazime?

Knyazê Îbrahim,

Akadêmîk, serkokê Yekîtiyên Kurdên Qazaxistanê.

***Qedir û hurmeta Şîrînê Elî di nav gel û cem rewşenbîran da
ewqasî bilinde ku, serokê Yekîtiya Kurdên Qazaxistanê,
zanyarê bi nav û deng, akadêmîk Knyazê Îbrahim rojbûna wî
bi dilekî baristanî pir paqîşva bi van rêzên lel-dure ne bîrkirîva
pîroz dike:***

ŞÎRÎNÊ ME

Pêncî sal boy te hindikin,
Sed saliya te em tev qutkin.
Boy gelê xwe pir pêwîstî,
Kîrnên xwe da heqî, rastî.
Destê ketiya tim digirî,

Cî radikî, nabuhurî.
Dilê te geş, baristane,
Hesreta te Kurdistane.
Wê bibînî serbest, aza,
Qutbin rehên dewa, doza.
Hebûna xwe bidî welêt,
Bêjî, min jî keda xwe rê.
Welat bibe gul, gulistan,
Tu jî li wê bibî xudan.

***Endamê Yekîtiya nivîskarê PEN-a Kurd, xwedanê pirtûkê
helbesta xwe da derheqa kemal û comerdtiya Şîrînê Elî da wa
dinivîse:***

Kengê navê esilzade dikişînin,
Navê Şîrîn tê ser zara berî tewa.
Dema mêzîna comerda dikişînin,
Yalê Şîrîn giran tê ji yalê tewa.

Kîderê ku qezyake tel diqewime,
Şîrîn tucar xwe ji wî cî nade paşe.
Wê qezyayê kuta dike bê doz, xeme,
Xuliqîye gel ra bîne gavên xaşe.

Kemala wî, pir kemala zêdetire,
Wê tim riya gelê xwe da dixebtîne.
Navê wî, çiyayê quve bilindtire,
Evdê bêçar tengasiya derdixîne.

ALFABÊYA KURDÎ

КУРДСКИЙ АЛФАВИТ

п/ п	Курдский алфавит (латиница)	Курдский алфавит (кириллица)	Русская транскрипция
1	A a	А а	А а
2	B b	Б б	Б б
3	C c	Щ щ	Дж
4	Ç ç	Ч ч	Ч ч
5	D d	Д д	Д д
6	E e	Ә ә	...
7	Ê ê	Е е	Э э
8	F f	Ф ф	Ф ф
9	G g	Г г	Г г
10	H h	Н н/Н'н'	...
11	I i	Ь ь	Ы ы
12	Î î	И и	И и
13	J j	Ж ж	Ж ж
14	K k	К к/К'к'	К к
15	L l	Л л	Л л
16	M m	М м	М м
17	N n	Н н	Н н
18	O o	О о	О о
19	P p	П п/П'п'	П п
20	Q q	Q q	...
21	R r	Р р	Р р
22	S s	С с	С с
23	Ş ş	Ш ш	Ш ш
24	T t	Т т/Т'т'	Т т
25	U u	Ö ö	...
26	Û û	У у	У у

27	V v	В в	В в
28	W w	W w	...
29	X x	X x	X x
30	Y y	Й й	Й й
31	Z z	З з	З з

Rêdaktorê berpirsiyar: Hejarê Şamîl
Korrêktor: Hesenê Rizgoyê Paşê

Ответственный редактор: Гажар Шамилович Аскеров
Корректор: Гасане Рызгойе Паше

Тираж: 500 экз.

Vê pirtûka xwe rewayê welatparêzê
giranbaha

Mehmedê Siloyê Bava

dikim, kîjan ku di jiyana min da roleke
mezin lêyistiye.

Weşanên Zengezûr

Rêdaktorê sereke: **Hejarê Şamîl**

hejare_shamil@hotmail.com

Rêvebir: **Gulşana Musa Xelîlova**

PDF:

Enstîtuya Kurdî ya Qefqasyayê

Web:

<https://www.ensiklopediyakurdi.com/>

Tel.:

+7 918 073 48 79

